

Cezayê Beşikçi bû milyarek

Beşikçi bi zorê idara xwe dike, emrê xwe di hebsan de derbaskir. Heta niha cezayê ku jê re hatiye birrin heger razê sed emrên wî têrê nake û pereyênu ku wek ceza jî jê têne xwestin gihiştiye nêzîkî milyarekê. Hêzên dewletê û mehkemê hikûmeta Demirel ji Beşikçi 900 milyon pere ceza dixwazin.

Rûpel 15



DERDIKEVE

- Gış hazırlıyan teknikî, kadroyî û burokratîki ji bo derxistin û weşandina rojnameya 'Özgür Gündem'ê temam bûne. Gündem' rojnameyeke rojane ye û dê di 30'ê meha gulanê de derkeve

Rûpel 15

Kurd meşîyan

- ERNK û Partiya Kesk a Belçikayê, li Bruselê bi navê 'Azadî ji gelê Kurd re' meşekî pêkanîn. Bi hezaran kes besdarî vê meşê bûn.

Rûpel 15

Heyeta Finlandiyayê:

'Me rastî li cih dît'

- Ji bo ku em rastîye di cih de bibînin em hatin vir. Dewlet herêmê teroreke mezin bi kartîne. Em dixwazin ku her neteweyek qedera xwe bixwe tayîn bike. Mafen Kurdan jî heye ku qedera xwe bixwe tayîn bikin.

Rûpel 15

Şoreşa Kurdistanê şoreşa parastina mirovahiyê ye Abdullah Öcalan

Rûpel 6

Kesê ku ji gelê xwe re nebe ji dewleta zordest re qet nabe Leyla Zana

Rûpel 3

Amerika, Ewrûpa û Kurdistan Memo Nazê

Rûpel 4

Hilweşîna mêzin û statukoyen kevin tu fêde nade Komara Tirkîye Hêvî Can

Rûpel 5

Mandela û rojnamevaniya Tirk Veli Özdemir

Rûpel 5

Mêrên Kurd êsîrê jinebiyên Ewrûpi ne Zîna Şikakî

Rûpel 7

Kurd wê bi dengê xwe yê bilind bêdengiya cihanê bîşkînin M. Ali Tüysüz

Rûpel 8

Bi ci rengi "Kurdistana Sor" hate damezirandin û hilanîn? Prîskê Mihoyî

Rûpel 10

Rexnegirî û kultur Şerefîxan Cizîrî

Rûpel 11

Kurd hiqûqê şer dixwazin

Ser di nav PKK û dewletê de ye, divê her du alî jî ji hiqûqê şer re rîayet bikin.

- Şer di nav PKK û dewletê de ev 8 sal in dom dike Dewlet li kerê iblis siwar hatiye û ji êzingê xwe nayê xwarê. Ji Newrozê û vir de şape li Kurdistanê rakiriye û her der kiriye agir û barûd. Ketûber xelkê digre, di-kuje û ne li emir û ne jî li cinsê însen dinere.

- Gelê Kurd hiqûqê şer dixwaze. Têkoşîna gelê Kurd a neteweyî ji her alî ve Tirkîye dixe quncikekê teng. Hêzên dewletê pişî her êrişâ gerillayê PKK, bi gundên Kurdistanê dikevin, zarok û jinan dikujin, êsiran infaz di-kin. Ji bo vê yekê Kurd, hiqûqê şer dixwazin.

Rûpel 15

Wedat Aydin
rewşenbirekî welatparêz
û şoşeger bû.
Ew di têkoşîna rîzgariya
neteweya Kurd de
cîhekî bi rûmet girtibû.
Ronakbirekî bêtîrs bû.
Di têkoşîne de bi bîyar û
fedekar bû.
Li doza gelê xwe
bi awayekî rast xwedî derdiket.
Ji ber vê yekê
dewlet wî da kuştin.
100 hezar Kurd
besdarî cinazê wî bûn.
Roja cinazê hat rakirin,
li Amedê serhildan çebû.
Dewlet,
ji cinazê wî ji tîrsîya,
di dema rakirina cinazê de
hêzên dewletê
17 mirovân
Kurd
kuştin.



MEBÜSEN KURD JI MECLİSE DİPİRŞİN: 'QATILÊ WEDAT AYDIN KÎ YE?' Mebûsen wedatparêz ên Kurd ji bo ronikirina kuştina Wedat Aydin daxwaznameyek hazir kirin û dan serokê meclîse Tirkîye. Mebûse dipirşin: 'Kontr-gerilla dezgeheke resmi ye an na? Kontr-gerilla di bin emrê kî de ye? Ji bo belavkirina vê dezgehê hûn ci diffikirin? Ji bo eşkerekirina qatilên Wedat Aydin heta niha ci xebat hatiye kirin? Di destê we de ci agahdarî henê? Û hwd. Divê bersiva van pîsan bê dayîn.'

Mebûse Mêrdînê Ali Yîğit:

'Dewlet tovê neyartiyê dicine'

Ez dixwazim li ser gera we ya li Nisêbînê bipirsim, ji bo ci we pêwîst dît û hûn çûn Nisêbînê?

Di 16.5.1992 an de saet li 9'ê şevê şoreşvanan girtibûn ser gundê Dala, gundê Dala bi Nisêbînê ve girêdayî ye, lewra ku di gundê Dala de parêzgerên şoreşvanan ev êriş girîng ditibûn.

Şoreşvanan di vê êrişê de du mekinê leşkeran hilweşandibûn, - Saet li 12'ê şevê dest bi ope-

rasyonê kirin, gundi tev li makî kom bûbûn,

Rûpel 15

Şerê gerilla û leşkeran

Gerillayê ARGK ê di 25'ê Gulanê de li Xorasanê avahiyeke radyolîngê tarûmar kirin. Di vê êrişê de du personelên Radyolîngê hatin kuştin.

Li navçeya Bişêriyê gundê Midewrê hêzên dewletê û gerilla li hev xistin. Ev şer qasî 10 saet domand. Di vî şeri de 6 gerilla, 37 leşker, 1 teymen û astsubayek hatin kuştin.

Dîsa li navçeya Tetwanê

gundê Yolalan di navbera hêzên dewletê û gerilla de şer derket. Di vî şeri de leşkererek hat kuştin û panzerek jî hat texripkirin.

Roja 26'ê Gulanê gerillayê ARGK ê girtin 'ser qereqola Üzümlü, gundê Çukurca. Di vê êrişê de 21 leşker û 2 serbaz hatin kuştin. Gerillayen ji 20 heb zêdetir leşker jî êsîr girtin û bi xwe re birin.

Mekteb bûne qîşle

Rejîma 12'ê îlonê û faşîzma milîtarîstî neqebehî mezîn û texrifbatê kûr di mîjîyê idareciyê Tirkîye de çêkirine.

Dafrê û meqamîn dewletê gişbûne sextekar û bertîlxwer.

Bê rişwet, bê xatir û bê serêşî mirov ci karf nikare bike.

Memûr bûne eskerên hikûmet û dewletê, bûne istîxbarat û sixûrên emniyet û ewlekariyê.

Mekîne û aşê burokrasiyê bi carekê re milîtarize bûye.

Mektebên navîn yên di binya

zanîngeh û unîversitan re jî

di van mehîn dawî de ketîne ber şopa zihniyeta eskerî û nî-jadperestiyê.

Midûrên lise û mektebên navîn ketîne şûna polîs û zabîten eskerî. Her gav û her kîlî di du xwendevanan de

ne, li mektebê, li malê, li sûkê ci dikin, bi kî re hevaltiyê dikin, dê û bavîn wan Kurd in yan na, mijûlahiya wan bi si-

yaset re heye, tune ye, hebe çiqas bi kî re...

K.G. xortekî 17 salî ye. Li navça

Rûpel 15

ROJEVA WELÊT

Xetîp Dîcle dewletê îtham dike

Dewleta Tirk emirmende bûye. Emirmendeyî û kevnarî ne awantaj û xwirî ye li vir. Dewlet li pey zemîn maye, bersiva serdema me û hewcedariyê civateke duneteweyî nade. Dewlet û çerxa dewletê zingar girtiye. Ne tamîr dike û ne jî kes kare pine bike.

Rûpel 15

REWS

Abdullah Keskin



Ji her alî...

Vê hefteyê ez dixwazim li ser hinek pirs-girêkan bi kurtî bisekinim.

BELAVKIRIN

Gellek xwendevanê me ji bayiyê rojnameyan şikayet dikan. Dibêjin, em Welat li gelek deveran nabînin. Di vî babetî de tişte-kî ku em karibin bikin tune ye. Her bayiyê ku rojnameya "Sabah" û "Hurriyet" lê hebe, gereke Welat ji bigire. Ji ber ku em bi "Birleşik Dağıtım" belav dikan. Divê xwendevanê me li mafêن xwe xwedî derkevin, Welat ji her bayiyan bipirsin û yên ku belavnekin navnîşana wan ji me re bişînin. Bi vî awayî em bawer dikan wê ev pirsgirêk hal bibe.

NAMEYÊN XWENDEVANAN

Spas pirr spas
Nelson Mandela

Spas pirr spas ji Nelson Mandelâye şervan re, spas ji hemû nivîskarêن rojnameya Welat re, spas ji kalê Musa re, spas ji Yaşar Kaya re, spas ji Abdurrahman Durre re, spas ji Amed Tigrîs re û spas ji mamoste ê mezin İsmail Beşikçi re û spas ji C. Bedirxaniye mezin re, spas ji ew mirovî ku nehişt zimanê wî asîmîle bibe û bi zimanê xwe dinivîsîne û dixwîne re.

Dereng be ji cardin we xwendiyê rojnameya Welat û welat tev pîroz dikim û ji Nelson Mandela re ez nizanim çi bêjim. Ez vê zanim, evînek di dilê min de hebû û Nelson Mandela ew evîna dilê min tiji kir û ez rehet bûm xelata rûreşa li nav çavê wan xist. Û silav ji ew ên li serê çiyayê Kurdistanê li hember dijmin şerê germ dikan re.

M.Çaçan
Amed

Ji bo sazkirina welêt

Ji pêşberê her tişti, ez silavê xwe yên serfiraziye ji hevalênu keda wan derbasî weşandina "Welat" dibe re dişeynim. "Welat" ji berhemeye ku li ser xwîna şehîdan hatiye afîrandin. Ji bo vê sedemê, divê em ji wê re xwedî derkevin. İro, ji bo ronahîkirina berhemên dîrokî, çandî û neteweyî, ji bo sazkirina Welat û ji bo ku gelê me bi zimanê xwe, bi kurdî bixwîne û binivîsîne, keç û xorîn me, jin û mîrîn me canên xwe feda dikan û xwîna xwe dirjînin. Divê em ji wan ji bîr nekin û em ji berhemên xwe yên dîrokî, çandî û neteweyî re xwedî derkevin. Xwedîderketina berhemên neteweyî xwedîderketina şehîdan e, netewe û welêt e û xwedîderketina pêşmergeyêne me ye ji. Ji bo vê em bi we re ne. Serfiraziya we daxwaziya me ye.

Xemgîn
Enteb

Ez xorteki Kurd im û sêzdeh salî me. Ez diçim dibistana navîn. Zafê ma-mosten me neyarên Kurdiñi ne. Lî em ji tiştekî natîrsin. Tirsa me tenê ji xwedê ye û xwedê ji alî me ye. Heta ku xwedê ji alî me be emê serî hildin lewra

SERHİLDAN JİYAN E.

Bifiltin ji ber dîwara

Welat perçekirin, ji hev
belakirin
Em ji bîrkirin, em mane bê
wara
Mal û halêm tune, ax û
avêm tune
Cih û warêm tune, ketim
ber dîwara

Hinek li hepsa ne, hin li
serê çiya ne
Hemû bê çar mane, tev
mane bê wara
Welatê Kurda ye, kanya
zêra ye
Maye li bin destâ ye, em
man li ber dîwara

Ev welatê me ye, tev bax û
baxçe ye
Cihê kalê me ye, em mane
bê para
Zilmê li me kirin, bê cih û
war kirin
Ji hev belavkirin, xistin
ber dîwara

Xwişk û bira rabin, tev
rengê şera bin
Ne kolê axa bin, bibin
xwedi para
Bi hev re serî rakin, dijmin
ji hev belakin
Zilma li ser xwe rakin, bi-
filtin ji ber dîwara.
Nezîfe Misircî

KARTA ABONETIYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmara ... pê ve min bikin
aboneyê Rojnameya WELAT

Nav :

Paşnav :

Navnîşan :

Bedelê abonetiyê razînin:

Li Tirkîyê : Y. Serhat Bucak İş Bankası Cağaloğlu
Şub. Hesap No: 379809

Li Derve : Y. Serhat Bucak İş Bankası Cağaloğlu
Şub. Döviz tevdiat hesap No: 3113617

Aboneyen hêja,

Ji kerema xwe re vî cihî dagirin û tevlî kopyeke pelê
razandina bedelê abonetiyê bişînin. Navnîşana

WELAT Nuruosmaniye Cad. Atay Apt.

No:5 Kat:1 D.4

Cağaloğlu / İSTANBUL

Tel: 511 57 60-511 66 02 Fax: 511 51 57

Mercen abonetiyê:

Li hundir

Li derive

6 meh

60.000

30 DM

12 meh

120.000

ABONETI

Herkesê ku karta abonetiyê û qûpona
banqê ji me re birêdike, em rojnamê jê re
dişin. Heç negire bila ji kerema xwe xeberê
bide me. Girtiyê her hepışxanê ji xwe abone
ne. Her hejmar ji wan re diçe. Yê ku negi
rin divê ji idareya hepışxanê bipirsin.

NAMEYÊN
XWENDEVANAN

Ji berê de em dibêjin: Her xwendevanê
me, weke nivîskarê me ye. Em wilô qebûl
dikan. Gellek name û nivîsên xwendevanân
tên. Heta imkanê me hene em cih didine
van name û nivîsan. Kêmasiyêwan hebin
ji, ji bo ku xwendevan teşwîqî nivîsandina
kurdî bibin em çap dikan. Ziman, çiqas were
nivîsandin wê ewqasî bêhtir bi pêşkeve. Di
hejmarênuh de emê bêhtir cih bidine na
me û nivîsên xwendevanân.

FERHENGOK

Gellek xwendevanê me dixwazin, "Fer
hengok" firehtir bibe. Bi baweriya me zeh
metiya mezin xwendin e. Kesekî karibe ni

vîsên kurdî bixwîne, çend gotinênuh he
bin ji wê fêr bibe. Xwendin û nivîsandina
kurdî hêsan'e. Ji ber ku zimanê me yê zik
makî ye. An pişti 7 salan li mektebê em hî
nî zimanê biyanî dibin, an ji li leşkeriyê.
"Enstituya Kurdi" li ser ferhengekê dixebe
te. Di demeke kin de were weşandin em
bawer dikan wê valahiyeke mezin dagire.

SHOW TV

Di 6'ê Gulanê de ekîbek ji Show TV ha
tin buroya Welat. Buro kişandin qamerayê
û ji bo "32. Gün-Türkiye" roportajek Kurt
bi me re kîrin. 18'ê Gulanê gereke derke
tibûna. Sansur kîrin, derneket. Dewlet, li
alîkî pesnê demokrasiya xwe dide, li alîyê
din her derî li ber Kurdan digire. Lî ew de
riyê ku girtî mane sibe du sibe wê heta da
wiyê vebin.

ÖZGÜR GÜNDEM

Haziriyê Özgür Gündem (Rojeva
Azad) ev 2-3 meh in dom dikirin. 30'ê Gu
lanê derket. Em serkeftina Gündemê dix
wazin.

Navênek yekhejmar

Di mijara (babeta-konuya)
yekhejmar û pîrhejmar (te
kil ve çogul) de ji, taybetî
(özelliğ) û prensibîn zimanê
kurdî hene. Gelek kes ji bo
vê yekê ji hinek prensib û
qanûn çekirine an ji pêşkê
kirine. Lî, dîtin û teorîyê
wan di pratîkê de cih negit
rine. Dîsa ya herî baş û
tîkuz dîtin û prensibîn Cel
ladet û Kamuran Bedir
xan in. Em dîtin û pre
nsibîn wan bingeh digirin û
dixwazin di vê babeta yek
hejmar û pîrhejmar de qey
de û prensibîn ku heta niha
di pratîkê de pêk hatine, bi
awayekî vekirî bînîn ber
çavên xwendevanê xwe.

Navênek yekhejmar:

1) Heger navênek yekhejmar
bi serê xwe bin û
di nav hevokê (cumle) de
neyen bikaranın qet
pêşdayîn an ji paşdayîn (ön
ve arka ekler) nagirin û wek
xwe dimînin. Mînak: Amed,
Mîrdîn, hesp, mehîn, nan,
av, şer, mal û hwd.

2) Heger di nav hevokê
de pêşkera hejmarkî bigire:

a) Ji bo yekhejmara nedî
yar (neşkere, belirsiz) nîr û
mî pêşkera "-ek" tê dawîya
nav: Mînak: mehînek, hes
pek, xani(y)ek (*) û hwd.

b) Ji bo yekhejmara diyar
a nîr pêşkera "-ekî" tê pa
şıya nav. Mînak: Min hes
pekî beza kirî. Ez hewce
darê xaniyekî nuh im û
hwd.

c) Ji bo yekhejmara diyar
a mî pêşkera "-eke" (**) tê
paşıya nav. Mînak: Min me
hîneke qenc kirî. Ez hewce
darê maleke nuh im.

(**): Nabe ku mirov bêje an
ji binivîsîne yek hesp, yek
mehîn, yek nan, yek mal û
hwd.

(**): Bedirxanan bi xwe ji
vê yekê zelal nekirine. Hem
di dema wan û hem ji niha
caman mirov di şuna "eke" de
rastê nivîsandina "eka" tê. Lî,
ev form di pratîka salan de
nayê bikaranın.

Welatparêzi

Ez li dibistanê xwendevan im.
Dixwazim li ser kîmasiya hinek
hevalênu me yên xwe welatparêz
dihebisînin bisekinim. Belê ew
hevalênu xwe welatparêz dihe
bisînin, welatparêz tiştekî girîng
e, welatparêz pesindana şoreşê û
şoreşgeran tenê nîne. Welat
parêz hezkirina Welat e, hezkirina
ziman e, hezkirina gel e, hezkirina
çand û hunera neteweyî ye. Hezkirina
axa welat e. Mirov gava bêje ez
welatparêzim pêwîst e barê wê ji
bîne cih. Barê welatparêzîye ci ye? Barê
wê ev e; Hînbûna xwendin û nivîsandina
kurdî, di demekî kurt de hînbûna
zimanê zikmî, nav heval û hogiran
de peyvandina zimanê xwe. Ev bi tevâhî
hêzen welatparêzîye ne. Lî hevalê
me yên xwendevan bi pirrani van
hêzan nayin cih. Ji sed i heşte
bi zimanê xwe napeciyin, gellek
ji wan xwendin û nivîsandina
kurdî nizanîn. Ji bo hînbûna wê
ji naxebitin. Di vî babetî de ez
dixwazim mînak bidim.

Bi hezaran mirovîn me yên
mîrخas û bi rûmet ji bo xi
lasbûna gelê me û avakirina
welatekî serbixwe xwîna xwe
yên şerîn li ser axa welat rijandin
û hîn ji dirijînin. Rojnameya Welat
divê axê da şîn bû (ne li
Ewrûpa) bi xwîna van egît û
mîrخas tê avdan. Pêwîst e ku
li rojnameya Welat xwedî derke
vin û hemû hejmarênuh wê bixwî
nin û bidin xwendin. Lî ci şerm
e wan hevalênu me yên nîv welat
parêz xeynî hejmara yekemîn an
ji duymîn Rojnameya Welat
nestandin û nexwendin, gava ji
wan re dibêjim cîma rojnameya
kurdî naxwînîn? Bersivekî ecêb
didin "Ez baş nizanîm bixwînim,
pirr cih ji fîm nakim." Gotinek
Tîrka heye "Özüri kabahatinden
büyük" mana wî ev e. Mazereta
wan ji kîmasiya wan mestire.

Berî qedandina vê nivîsê
hêvidar im ji iro pê de ev
hevalênu nîv welatparêz çewtiya
xwe bibînin û kîmasiyen xwe di
demekî kurt de rûbarkin.

Jiyan Cotkar
Amed

FERHENGOK

Bêhempa: Bê emsal, yekane
(esşiz, yegane)

Birêvebir: (yönetici)

Bî kar anîn: Xebitandin, em
landin (kullanmak)

Berxwaden: Li ber rabûn (di
renîş, direnmek)

Dezgeh: Sazi (kurum)

Dilovan: Bi şefqet (şefkatli)

Geş: Ger (gezi)

Gengeş: Guftûgo (tartışma)

Gewrehêz: Qeweta mezin,
qeweta xwîrt (büyük kuvvet)

Gelempêrî: Giştî, genel

Hest: Hîs (duygu)

Hewl: (çaba)

Ji ber ku: Çunkî, lewre

Navneteweyî: Enternasyonel
(uluslararası)

Penaber: Multecî

Penaberî: İltifa, multecî

Pexşan: Nesîr (düz yazı)

Rêziman: gramer (dil bilgisi)

Şewe: Awa (biçim, şekil)

Bi vî şeweyî: Bi vî awayî (bu
şekilde, böyle)

Têkçûn: Mexlubiyet (yenilgi)

Yarmetî: Alîkarî, piştgirî

Zar: Ziman (konuşulan dil)

Zarê pexşanê: Zimanê nesîre

Zarê helbestê: Zimanê şîirkî

Wekhev: Mînahev (eşit)

Wekhevî: Mînahevî (eşitlik)

Pîreka Weysî Orhan, Meyase Orhan:


'Li ber çavêñ min Weysî kuştin'

(NISEBÎN - WELAT)

6'ê Gulanê saet 10'ê şevê, li taxâ A.Kadir paşa (Cizir) dengê teqîniyekê hat. Dûre jî dengê çekan (sîlahan) dest pê kirin. Bi rastî her şev şer hebû û dengê sîlahan dihat, lê ew ne wek şevê din bû; tu şer çenebûbû. Hêzên dewletê dora xêniyekî girtibûn. Ev xanî sitargeh (siginak) a gerîlayê PKK ê bû, tê de 6 gerîlla hebûn. Gerilla teslîm nebûbûn û ji bo sax nekevin dest xwe kuştibûn. Pişti vê hediseyê ji welatparêzekî Nisêbînî, kurê Wesileyê Tewfik, di mala xwe de ji teref û derî li me girtin. Dengê

Pişti çend deqîqeyên din li deriyê me dan, gotin, "em polis in derî vekin."

Weysî çawa derî vekir, bi hêrs ketin hundir, xwe avêtin ser Weysî, bê pirs û bê sual dest pê kirin li Vesyi dan. Kulmek li min jî dan û ji min re gotin Weysî telefonê kuderê dikir... Dûre mala me serûbin kirin, li her derê mala me geriyan. Ji min û Weysî pêştir sê zarokên me yên biçûk, Agit (du sal û nîv i), Çidem (çar salî), Zinar (yek salî) ji hebûn. Ez û zarokên min xistin menzelek (odeyek) û derî li me girtin. Dengê



Weysî Orhan

min kirin û gotin, sîleha mîrê te heye, li kuderê ye?" Dema min got" sîleha wî tune", ez avêtim erdê û li min dan. Dema ku wan li min dixistin, dengê teqîniya sîlehekî ji cihê ku Weysî lê bû hate guhê min.

Wan hîna jî li min didan. Pişti pênc deqîqeyên din dengê hejmarek sîlehan hat guhê min, pey re jî ji derve, ji serê ban û ji her der dengê gulle û berekan zêde bûn. Daviyê wan ez berdam û çawa ez serbest mam min xwe avête menzela ku Weysî lê bû. Min dît ku Weysî li ber piyêwan di xwînê de dirêjîkirî ye. Min dest bi qîr û hawarê kir. Dîsa dest bi lêdanê kirin, bi pehîna li zikê min didan û dijûn (sixêf) dikir, digotin, "Mîrê te ji te re çi kiriye û çiqas bi kîrî te hatiye ku tu li ser digirî. Paşî çavê min girêdan û bi pora min girtin, ez li pey xwe kişîşandim û xistim erebê.

Du roj li qereqolê di bin çav de mam. Dema ez ji bin çav derketim di şûna Weysî de min tirba Weysî dît!

Paşî ên ku cendekê Weysî dîtibûn ji min re gotin 7.berek berdane singê wî, ji pas ve ji berekek berdane mîjîyê wî...




Weysî Orhan (li alîyê çepê) di filime "Mem o Zin" de leyîsti bû.

leşkerên Tirk ve tê kuştin, dûre Tewfik jî davêjin nav van 6 gerîllayan, çawa ku ew ji yek ji wan be û intîxar kiri-be.

Dîsa eynî ew şev, çar saet pişti vê hediseyê tîmîn taybetî (özel tim) digirin ser mala M.Weysî Orhan, wî ji dikujin û davêjin nav gerîllayan. Pirêka M.Weysî Orhan qetikirina Weysî, ya bê sual û bê pirsayar wiha tîne ziman:

-Wek her roj ew roj ji Weysî dîsa saet li 7 an hatibû mal. Pişti serê xwe şûst û ti-raş bû, dengê teqîniyekê ji derve hat. Pişti vê teqîniyê Veysî telefonê cihekî kir. Dema wî telefon dikir ez ji li metbex (mutfak) ê bûm, dengê wî baş nedihate min. Hingê saet nêzîkî 10 an bû. Dûre em razan. Derengê şevê bi hînek dengê ku ji ber pencera me dihatin ez şîyarbûm. Min rabû lembê pê xist û li saetê nêrî. Saet ji duduwan derbas dibû. Weysî ji şîyar bû. Ji çar terefîn mala me tepe repa piyan dihat û çiqas diçû dengê piyan zêde dibû.

Weysî dihate me, lê dixistin û qîra didanê digotin, "sîleha te li kuderê ye?". pişti demeke kurt hatin gazi min kirin, ji min kîrekî xwestin. Min kîrê ji wan re anî, pişti min kîrê da wan dîsa ez xistim menzela zarokan û derî di ser me re girtin. Çend kîliyê din di ser re derbas bûn careke din gazî



Meyase Orhan û zarokên wê; Çidem, Zinar û Egîd

KONEVANIYA NUH

Leyla Zañâ (Parlementera Amedê)



Kesê ku ji gelê xwe re nebe ji dewleta zordest re qet nabe

B elê ez niha kûr difikirim û diçim dema hilbijartina Parlamente. Dema ji bo propaganda hilbijartinê, ku em diçûn nava gelê xwe, gelê Kurd gellek pirsan ji me dikirin, di hilbijartinê de li Qulpê civînek hate afirandin, şirovekirina gel ev bû "Em tiştekî ji we naxwazin, hêviya me ji we ev e ku hûn li sozê xwe xwedî derkevin, gelê xwe nefiroşin, bi bîr û bawerî li gelê xwe xwedî derkevin, doz û mafêñ gelê Kurd, zilm û kotekiya li ser gelê Kurd li cîhanê belav bikin, hînek ji pirsgirêkên gel bi destpêkanî û emelê wê safî bibe û hêza gel xwirtîr bibe". Belê, iro ez jî di nav de, parlementerên Kurd, em çiqasî wezîfîn xwe pêk tînin, em çiqasî bûne layiqê gelê Kurd ku em wan temsîl dikin, me çiqasî pirsgirêkên wan hal kirine, kul û birînên wan me çiqasî li hev par kiriye, girîng e ku em muhaseba vê bikin. Gelê Kurd em şandine parlamento, ji bo ku em ling bavêjin ser hev, di kursiyê de xwe bizivîrinin, miaş bistînin, û li rewşa xwe meyzînen?

Gel, em şandine parlamento ji bo ku em lê xwedî derkevin, kul û birînên wan li hev par kin. Zilm û zora li ser serê wan li cîhanê belav bikin, û li heq û mafêñ wan xwedî derkevin. Ger li gora imkanen xwe ku em nikaribin heq û mafêñ gelê Kurd li cîhanê bîparêzin, û li pirsgirêkên wan nebîne xwedî tu mana wê tuneye ku em bibêjin em gelê Kurd temsîl dikin, bi rastî jî nedengirin şerm e û sîc e, ku em wezîfî xwe pêk neyînin û nebîne xwedîyê gelê xwe.

"Barê gel giran e, geleki jî giran e ku em nikaribin vî barî hilgirin, kesê ku dikare hilgire, bila ew werin vî barî hilgirin, a rastî ev e, em naxwazin ku gelê me ji me zerarê bibîne.

Girîng e ku em rind zanîbin, heyânî ku axa me û mîjîyê me azad nebe, yekîtiya gelê me ji saz nabe, xebatek ku ji dil û can nebe, wê xwestin û daxwazîn mirovan jî fetîsi be. Heval Mehdi Zana di axattinek xwe de wiha digot: "Ji mebûsan dibe ku hînek wezîfîn xwe pêk neyînin, nebîn xwedîyê sozê xwe, dibe ku hînek vê yekîtiye xera bikin, dibe ku hînek bitîrsin, hînek bikevin, bi plajî sor û bi çend îhala gel bifiroşin, lê belê, vêya rind zanîbin, wê roj were wê gel hesabê vê bixwaze, ew dem derbas bû, bi fen û fûta li ser pişta gel kes nema kare bicêre".

Tirkên Mesket têne Tirkîyê

2000 Tirkên Mesket-Ahiska têne Tirkîyê. Hikûmeta Süleyman Demirel li Trakyayê û li bajarêñ Kirkclareli, Tekirdax û Sekaryayê ji bo 2000 Tirkên-Mesket haziriya xanî, cih û malan dike. Heta niha ji bo van kesen ku wê li bajarêñ li jor binavkirî cih û war bibin zêdeyî 200 milyon mesref hatiye kirin.

Di derheqa Tirkên Mesket-Ahiska de Sazendeya alîkariyê Kizilaya Tirk ji piştgirîya hikûmetê dike û dibêje em "amade ne ku em desten xwe bidin pişta wan. Ew birayen me ne, ji xwîna me ne û tarîxa meyeke".

Wek tê zanîn di 40-50 salêñ dawî de hikûmeten Tirkîyê he-ta niha çend caran ji welatên Balkanê mîna Bulgarîstanê, Yewnanîstanê û demekê ji ji

Yûgoslavya malbatêñ Tirk tâ-nîn Tirkîyê û hin caran jî mi-hacîren van welatan li Kurdistanê bi cih dikirin.

Salêñ ku li Efganîstanê şer hebû, piir kesen Efganî ji qeble Tirkîyê kiribûn û gelek ji wan li bajarêñ Kurdistanê belavkiribûn.

Dezgahêñ militarîstî û nî-jadperestî li aliyeke propaganda dikin û dibêjin Kurd geleki zarokan çedîkin nifûsa me zû zêde dibe û sebebê ku AT sûka Ewrûpa me qebûlnake nifûsa zêde ye û li aliye din hersal çend hezar "Tirkên" filan û bêvan mîna hemwelatiyan qebûl dikin û ev birayen me û ji xwîna me ne dibêjin.

Wê kî baweriyê bi hikûmet û dewletê bîne pişti ewqas durûtiyan.

Kemal Birlik girtin

Roja 25'ê meha Gulanê Emniyeta Enqerê gitte ser mala Kemal Birlik û ew girtin. Kemal Birlik berê mebûs bû wek mebûsê partiya ANAP ê demekê di meclîsa Tirk de kar kir.

Dewlet Kemal Birlik bi alîkariya PKK îtham dike û dibêje hînek ji hatina komira Şîrmexê daye Partiya Karkerê Kurdistanê (PKK).

Mala Kemal Birlik li bajarê Enqere ye û li taxâ Batikentê rûdine. Belê pişti ku li ser îxbara emniyeta Sîrtê li Enqere hate girtin ew neqlî Sîrtê kirin.

Niha Kemal Birlik û şîrîkên xwe yên komirê giş li Sîrtê di bin çavdîriyê de ne û rewşa wan çawa bûye em hê nizanîn.

Carna ez bala xwe didimê ku hin hemwelaşî hene dibêjin: "Ewrûpa Tirkiyê naake Bazara xwe ji ber ku 'mafêñ mirovan' û 'pirsa kurdi' çareser ne bûye; PKK ne partiyeka demokratik e, hwd..." Ez nizanim kîjan rojê Ewrûpî an dewletên dinê berketiyê mafêñ mirovan bûne! Ez nizanim Kîjan rojê dewletek, an dezgehekî navneteweyî ji PKK demokrattir bûye! Ev ramadîna (fikirkirin) hanê romansiyet e; xelkê em bi mèdiyên xwe xapandin e. Herwekî ê me Kurdan jî dezgehekî me nîne ku rastiyyê diyar ke, em diçin "rastiyyê" xelkê dixin serê xwe. Nîv-Tirknas û nîv-Kurdnasekî hin berî niha bi çar salan zanibû ku Dewleta Tirk naakeve Bazara Ewrûpî. Camêrê Markîs digot: "Siyaset tev aborî (ekonomî) ye. Kêşa (mesela) dagirtina welatekî jî aborî ye, mese-la kolîkirina milettekî jî aborî ye." De ka em hinekî dirêjtir herin.

Xwiška Novîn Hersan di "Armancê" (hejmar 124, Çileya Pêşîn 1992) de gotarek ji îngilizî wergerandibû. Gotar di "Financial-Times" (24.01.1990) de belav bûbû.

Mûsil serxwebûna xwe dixwaze

Kurd, Asûrî, Tîrk û Erebêñ bajarê Mûsilê serx-
webûna xwe ya bajêr û dora bajêr dixwazin. Ji
bo vê yekê konseyek çekirine. Navê konseyê
"Konseya Wilayeta Mûsilê" ye.

Konseya Wilayeta Mûsilê berî bi hefteyekî li Paytexta Tirkîyeyê Enqere belavokek belavkir. Di vê belavokê de Konsey ji Yekîtiya Miletan ali-karî û pistgirivê dixwaze.

Di belavokê de sinorêن bajarê Mûsilê li ser esasê Raporêن sala 1925 an têne diyarkirin. Serokê Konseyê Abdulkadir Birefcanî ku bi 12 damezrênerên Konseyê re li Enqere ye vê dibêje: "Em ne bi tenê hereketek Kurd in. Di nav me de Kurd, Tirk, Asûri û Erebêن Mûsilê ji hene."

Heyete Konseya Mûsilê hê li Enqera ye û bi wezareta derive ya Tîrkiye re jî rûniştin û hevdû dîtin cêdîkin.



GOTİN

Yaşar Kaya

Fehmî Bîlal, Faîk Bûcak, Seîd Elçî

Bi Tirkî Liceli Fehmi, Fehmî Bîlal ji Licê ye, di dema serhildana Şêx Seîdê kal (Şêx Seîdê Paloî) de katibê gorbuhuşt bû. Pişî bidarvekirina Şêx Seîd ew jî direve diçe binê xetê. Mîna Nûredîn Zaza, mîna Dr. Nafîz, mîna Qedrî û Ekrem Cemîl Paşa, mîna Memdûh Selîm Beg. Diçe binê xetê lê vala namîne. Welatparêzên Kurd dixebeitin, wan giş zordestî dîtine, Dadgeha İstiklala Diyarbekirê dîtine, neheqî dîtine, zor û zehmetî dîtine. Fehmî Bîlal, li wê derê ji bo Xoybûnê dixebite. Di civata Xoybûnê de dest dide destê Celadet Bêdirxan, Xelîf Rehmî, Memdûh Selîmê Wanî, ji Berazya kurê Şahîn Mistefa, Birê Şêx Seîd Mehdi û ji xelkê Silêmaniyê Abdilkerim, Xaço, Emînê Ramanî, Feqî Evdillah, Xurşît, ji

Merdînê Tevfîk Cemîl.

Dawî ji hev diqetin. çend sal paşê Fehmî Efendî tê welat. Çend salan li Îspartayê dice menfayê (sirgûnê). Du kurên wî hebûn. Sirrî Tûran li Bedlîsê evûqat bû, bi şik û şâibe hate kuştin, elbet ji bo me bi şik û şâibe nîne. Sala 1959 an de midûrê emniyeta Bedlîsê (ku navê wî li cem me heye) bi şev Sirrî Tûran li cîpa xwe suwar dike, dibe dikuje. paşê ew midûr hate Îstenbolê, em wî rind nas dikan. Kurê wî yê din Zerdûst piştî eskeriya xwe ye Qoreyê, li Japonyayê banqeyekê dişêlinê. Paşê hate Tirkîvê niha ci dike nizanim.

Niha di kitêban de dixwînim. Fehmî Bîlal gazî Seîd Elçî dike dibêje em partiyekê çêbikin. Partiya xwe çêdikin, gorbuhuşt Faîk Bûcak jî tînin serokatiya partiyê.

Kekê Faîk mîrxasekî bi nav û deng bû, ji bo wî tirs û xof tune bû, ji gelê xwe zehf hezdikir. Hê ji serî de riya welatparêziyê dabû pêsiya xwe. Pişî 27 ê Gulanê (27 Mayıs ihtilali) ew ji tevlî 55 Kurdan çû qampa Sêwazê, paşê sîrgûn kirin, dawî da-geriya Siwêregê. Paşî em gişk zanin ku bê cawa hate kustin.

Rehmetiyê Seîd Elçî dostekî min ê zehf hêja bû, ji min zehf hezdikir, em du caran bi hev re ketin hepisxanê. Me beriya girtina pêşîn hev nasdikir. Di zindana Herbiyeyê de hucra wî li pêşberî min bû. Hem xwîr ketibû canê wî hem jî xwîn ji devê xwe davêt. Bi me re henek dikir, digot: "Kekê Müsa ïnad nîne ez namirim." Gazi min dikir digot: "Castro bavê mîran e." Em tu wextî ji hev ne êşîyan, dawî mala xwe bire Diyarbekirê, êdî me hev û du nedît. Min bi-hîst ku li Diyarbekir hatiye girtinê, dadgehan wan li Antalyayê bû. Divê di dîroka Kurdishanê de çiqas dadgehên Kurdan hene bêne nîvisandin û bibin kitêb.

Lê belê ev gotin rast e, ku dibên "têjikêmaran bê jehrî nabin". Dîrok wek helqeyêncinciran e, her helqeyek di nav yekî din deye. Fehmî Bilal têkoşerekî bê deng bû. Lêtbelê ew heya roja mirinê bi tenê nîn bû. LîDiyarbekirê heval gelek diçûne dîtina wî. Kekê Melîk Firat heya mirina wî dostaniyaxwe jê kêm nekir. Ew xebata ku min destpê kiriye ez li ser dixebeitim "**Xoybûn O Serhildana Agırî**", tê de emê gelek tiştanbêjin ji bo gorbuhuşt Fehmî Bilal.



George Bush

wana Bush bi xwe rabûye. 2-
Berjewendiyênen miletên van
dewletan ku me li pêş hewal
danî tev hevdû nagire. Ew he-
valbendi di navbera hikûmetan
de ye. A dinê, pirraniya van
dewletan problemên xwe ji lin-
gan heya serî hene. Eger
hikûmet li Amerika were gu-
hertin, ev hevalbendi zû
têkdiçe. Dewleta duyemîn ji vê
hevalbendiyê Fransa ye, ew jî
ji dest opozîsyona xwe pûç
bûye. Eger Sosyalist bêjîn
"mast sipî ye" jî, opozîsyon
dibêje "res" e.

Li péş mējiyên "New World Ordre" du rê mane: 1) Eger si-yaseta xwe berdewam kin, dewletên ku di destê wan de henin jî dirin; 2) Eger sîndâ valikir


dicin. 2) Eger şunde vekişin, belki temenê ('umir) xwe hinekî dirêj bikin. Helbet, Amerika û Fransa riya duyemîn girtin.

Encamên riya duyemîn ji
 Kurdan re ci ye? Xwediyyê "New World Ordre" divê "dostê" (yek jê Kurd in) xwe yên doh berdin û bibin "dostê dijminê" doh. Herwekî perçekirina Ewrûpa naçe serî, divê xerîta Rojhilata Navîn ji mîna berê bimîne. Di vir de, wê berebere dest ji Kurdan berdin. "Libération" a Sosyalîstên Fransa êdi li diji Kurdan dinivîsîne. Çend mehîn dinê wê çira kesk ji Dewleta Tirk re vêxin ku sînorêن xwe li ser Kurdên Başûr bigre û wan di destê Sedam Husêن de dîsa berdin. Dimîne PKK?

Eger komployek ku li ser serê miletê Kurd û PKK de bê, wê ne ji dewletên dagîrker de were, wê ji Amerîkaya Bush û Fransaya Mitterrand de were. Gava Îranû û Îraqê Kurd di nav xwe de kiribûne gog û lêdidan, plana wê gewrehêzên emperyalist ji wan re dataanîn. Dewletê Rojhilatê Navîn di destê wan de wekî bûka ne; berjewendiyê wan cilo xwestin, wisa pê dilizin.

Bi vî awayî, xerîta navçê mîna berê wê bihêlin. Yekî wekî Gérard Chaliand hên ji destpêkê de zanibû wê ci bi serê Kurdan were. bi dilekî şâ wisâ dinivîsîne: "Kurd êdî bi şerê çekdarfî nîkarin li perçakî Kurdistanê mafekî bistîmin, r.32". İro, ji berê bêtir divê Kurd li ser hev bin û piştevaniya şerê gerfilla bikin. Carekê hele bala xwe bidinê li Rojhilate Navîn ji bilî Kurdan kî tê kuştin? Çare ji bilî şoreşekê nîne. Ev şoreşa hanê di Bakûr de gurr e. Amerika û hevalbendên wê dixwazin "Yûgoslaviyekê" ji Kurdistanê cê bikin.

Memo Nazê



Mahmut Alınak îstîfa kir

Mebûse Şîmexê Mahmut Alınak hefteya li pey me ma ji wekîtiya serokayetiya grûba SHP yê meclîsê îstîfa kir.

Mahmut rexnên xwirt li SHP girtin û xwe ji wezîfê kîşand.

Gelê Kurd û nemaze milyonen ku di hilbijartina payîza 1991 an de dengê xwe dane HEP ê, ji mebûsên xwe dixwazin ku bê deng nemînin û ji SHP ê îstîfa bikin.

Bi ya xelkê gerek Mahmut Alınak û çend mebûsên mane, hê di nav SHP de ne ew ji îstîfa bikin û bi temamî têkiliya xwe bi partiya lawê Înönü re bibirrin.



Fermana

Nusret Demiral

Roja 22'ê Gulanê cêgirê serokê Meclîsê Yılmaz Hocaoğlu fezleka Nusret Demiral, sawciye DGM ê da Meclîsê.

Wek tê zanîn bi vê fezlekê sawciye DGM Nusret Demiral dixwaze mafêne mebûsên HEP ê yêne mebûstiyê rake, wan bê çek û bê parêzgerî bihêle û kîlîka ku dilê wî bixwaze polîs bişîne û wan bigire.

Ev fezleka Nusret Demiral ev cara çêndan e ji Meclîsê re tê şandin xwedê inçex zane. Nusret Demiral bela xwe ji mebûsên Kurd venake, ileh dixwaze wan ïdam bike.

Fezlekê heta niha ku ji serokayetiya Meclîsê, Husamettin Cindoruk re hatin bê netîce man. Cindoruk bi paş de dişandin û tiştê wilo çenabê digot.

Fezleka dawî bi însiyatîfa Yılmaz Hocaoğlu cih (wekîlî) girê Husamettin Cindoruk tê meqamên têkildar.

Hilweşîna mêtzin û statukoyê kevin tu fêde nadé Komara Tirkiye

Eger em pêşveçün û guherînê li herêmê bikaribin baş binrixnîn, di têkoşîna rizgariya neteweyî de em bêhtir dikarin biser bikevin. Herêma Qefqesya dikelije. Tiştênu ku li vir dîbin me eleqeder dikin. Di van rûdan û pêşveçûnan de divê em bizanibin cih û rolên Tirkiye û Iranê çine. Ev herdu hêzên han ji bo demek dirêj wê li pêşberên hev rawestin. Li hemberî têkoşîna rizgariya neteweyâ me, nikarin hevbendiye-ke diyar saz bikin

Hêvi Can

Bi hilweşandina sazûmana sosyalîst re êdî tu mana têkilî û statukoyê kevin jî neman. Niha dinya me di domaneke nuh de ye. Mêzînê niha jî, li gorî têkilî û pêwendiyê hêzên nuh têne ava kirin. Ev doman jî gellek zor derbas di- be. Ji lewre di dinê de guhe- rînê bingehî çedîbin.

Dema rola Sovyetê, li ser siyaseta dinê qediya, tesîra vê rewşê ya herî mezin li ser herêma dora wê çebû. Gava sazûmana Sovyetê têkçû, li herêmê tevî heviyên mezin destpêkirin. Wisa tê xwiyan heta mêtzinênuh derkevin holê, wê gellek hevberî û li- hevxistin derkevin. Ji ber vê yekê ew pêşveçün û rûdanênuh derkevin holê divê ku wek surprîz neyên dîtin.

Eger em pêşveçün û guherînê li herêmê bikaribin baş binrixnîn, di têkoşîna rizgariya neteweyî de em bêhtir dikarin biser bikevin. Herêma Qefqesya yê dikelije. Tiştênu

ku li wir dîbin me eleqeder dikin. Di van rûdan û pêşveçûnan de divê em bizanibin cih û rolên Tirkiye û Iranê çine. Ev herdu hêzên han ji bo demek dirêj wê li pêşberên hev rawestin. Li hemberî têkoşîna rizgariya ne-

Tirk tev li dora xwe berhev bike, an jî dewleteke Tirk a mezin ava bike. Iran di pêsiya mezinbûna Tirkiye de dixwaze astengê dijwar derxe. Ji lewre mezinbûna Tirkiyeyê ji bo Iranê tehlûkeyekî mezin e. Eger Iran bikaribe li ser dewleten Qefqesayê yênuh te- sîr bike, wê demê dê dewleten rojava xwe bêhtir bi aliyê Iranê ve berdin, anku nêzîk bibin. Ev jî ji bo Iranê hewcedariyeke mezin e. Ji bo berdewama rejim û berjewen- diyê û lazim e. Iran roj bi roj cihê xwe xwirtir di-

nîstanê de hevbendiyeke tabîî heye.

Tirkiye dixwaze ku bi Ermenîstanê re li hev bê. Anku Qerebab ji Ermenîstanê re û Nexçivan jî ji Azerbaycanê re be. Nijeta Tirkiye ev e: Dixwaze ku, bi riya Nexçivan û Azerbaycanê derbasî Asyaya Navîn be. Lî Ermenîstan û Iran rînadin tiştekî wiha. Ji lewre derbasbûna Tirkiyeyê ya Asyaya Navîn ji bo Iran û Ermenîstan û herwiha ji bo dewleten herêmê tev wek tehlûke tê dîtin.

Rewşa herêmê, rastiyeye



Tirkiye
bi terorê
nikare
çarmedorê
têkoşîna
rizgariya
neteweyî
bigire.

teweyâ me, nikarin hevbendi- ke, ke.

Iran ji bo ku bikaribe bi- gihêje armanca xwe, polî- kayêni İslâmî ya dijwar û hisk najo. Iran him têkiliyê re yêni bi dewleten Tirk re, him jî li hev nayê. Ev jî gellek im- kanan derdixe pêsiya me. Tir- kiye dixwaze ku komarêne

iran ji bo ku bikaribe bi- gihêje armanca xwe, polî- kayêni İslâmî ya dijwar û hisk najo. Iran him têkiliyê re yêni bi dewleten Tirk re, him jî li hev nayê. Ev jî gellek im- kanan derdixe pêsiya me. Tir- kiye dixwaze ku komarêne

wiha siyasi derdixe pêsiya me. Her wiha vê rastiyê jî derdixe holê, Tirkiye di vê rewşê de nikare çarmedorê têkoşîna rizgariya neteweyî bigire û wê tecrîd bike. Eger ev imkanen ku derketine pêsiya me em bikaribin baş binrixnîn, ev doman wê bibe domana azadiya Kurdistanê.

Mandela û rojnamevaniya Tirk

Veli Ozdemir

Serokê komcivîna Efrîka ya Neteweyî, Nelson Mandela ku xelata Atatürk red kir ji devê çapemenî (basin) yê agir bariya, çapemenî ev nav li Mandela kirin "Barış ödülü teröristi (zorbazê xelata aşî)" , "Mandela Kürtlere mağlup (Mandela mexlûb, ji Kurdan re)", "Çırkin Afrikali (Kerh Efrîqahî)". Belê ê ku ev bûyer bi diruştî jî berhevkirin hebûn.

Bûyer çibû? Mandela ji hêla mirovîn sipî dihate perçiqandin, serokê gelê Efrîqayê bû. Berya niha dîbin navê "Barış korumak (Parasîna aşitîyê)" de sekreterê giştî ê Nato Joseph Luns a bi sedan xort di sêdarê re derbaskirin û demokrasî ji holê rakirin, ji ber ku serokê Derba 12'ê Ilonê Kenan Evren, ev xelat stendibû, Mandela ev xelat qebûl nekir, ez jî dibêm ji ber ku Mandela ev xelat qebûl nekir, ez wî gelekî xwe- dî maf û dirûst dibînim. Ev



Nelson Mandela

mirovîn ku Mandela rexne dikin, qey nizanîn ku reşikên Efrîkî ji sed salan ve, dibin darê kotekiyê de bin û li Tirkiyê jî gelê Kurd di rewşa re-

sikên Efrîkî de be Mandela xelata Atatürk qebûl nake. Ewênu ku Mandela rexne dikin qey vê rastiyê nabînî? Wan li ser xwe wa- cib û wezîfe dîtine ku ji dewletê dewletîtir bin.

Heyanî doh ji devê resmî ku sixîf didan ji Çetin Altan û Mehmet Altan re, vêca iro rastiyê dibîn û li ser Mandela dînîsîn dibîn "xelata tirkî bona çi qebûl nekir "Mehmet Altan jî di sermîsara xwe de "kızılık kontrolü ve Mandela" daye xwiyakîrin û wiha gotiye: "Li rojavayê ku pîsi bi wan dane xwarin

em nahejmîrîn, gundiyyê ku diherine hejîr difroşin ku têne berekkirin (kurşunlanan) nayête bîra me, heke sîxîf çare be em sixîfa bikin, belê ku

sixîf çare be, kesê kerh wê tev herin ji eynikê re sixîfa bikin bona ku spehî bibin.

Ji bo spehîbûnê her roj di herin ji eynikê re sixîfa dikin û realîta Kurd nabînî, qey ne li ser bana li dînê dimeyzînîn, ew ji şibakan li dinê dimeyzînîn, loma dinyaya wan jî biçûk dibe.

Devê resmî bê çawa bersîva Çetin Altan nedan, ji xelata ku Mandela qebûl nekir zêdetir tirsa wana mezin ku pirsgirêka Kurdan di konevaniya dinê û Neteweyîn hevgirtî de were şirove kirin.

Ewqas tirs, ev agirê ku di- binê wan de vêxistî, sedemê vê tev pirsgirêka Kurdan e, bê çawa roj nayê sihandin, rastî jî nayê windakirin. Mandela li Johannesburg ê ji rojnamevanan re wiha digot: "Xelata ku min bi paşde vegerand, ne ji hêrsa min a li hemberî gelê Tirkiyê bû, li Tirkiyê zilma ku li Kurdan tê kirin ne mumkun e ku ez ji ber çav bidim alî.

Mesaja Serokê ERNK Abdullah Öcalan ji bo gelê Kurd:

'Şoresa Kurdistanê şoresa parastina mirovahiyê ye'

● Serokê ERNK Abdullah Öcalan wiha dibêje: "Me di van çend salên çûyin de, plana ku dijmin ji xwe re danibû, xirab kir, amadekariyên ku dikirin me hilanîn. Dijmin nikare mîna berê serhildanan hilîne, nikare şer bide sekinandin, yanî tiştê ku neyar dixwaze bike, nikare bike. Ne weke berê ci demê bixwaze qir bike, em li vir dîrok û qehremaniya partiyê dibînin, dîroka partiyê ev e"

Berî her tiştî ez şehîdîn Kurdistanê û kesen di serhildana Nisêbîn, Cizîra Botan... û Şirnexê de, bi silavên şoreşgerî silav dikim.

Di vê Newrozê de (1992), me ji her demê bêhtir da xwiyakirin ku gavê em davêjîn gavê serxwebûn û azadiyêne, gavê yekîfî, berxwedan û serkevtinê ne.

Belê, di destpêka vê salê de dijmin geleb tişt got û xwest gelek tiştên dûrî mirovahiyê bike. Digot; emê li we xin, emê we hilîn. Bi rastî jî hînek kîrinê wiha kîrin, we dît li gelek cihê Kurdistanê dest bi tirsandin û qirkirinê kîrin. Ne tenê di vê sala 1992 an de, di 1925 an de jî vebirrandine ke wisa çêkirbûn, di 1938 an de jî ev hovîtiyên xwe derxistin meydanê, her wiha li başûrê Kurdistanê jî xwe bi vê hovîtiyê da diyar kîrin, dîroka dijminê me li ser vê bin gehê hatiye avakirin. Ditîrsîne, direvîne... û yên mayî jî wan ji xwe re dike xayîn û teslîm distîne.

Neyar xwest vê planê di 1992 an de li ser me jî bimeşîne. Bi rastî bi giranî hate ser me, lê hema em ne Kurden berê ne, ku dijmin ci bike û jê re bimîne, ci bixwaze bike û li dawiyê bi serkeve, me rî neda. Texmîna ku dijmin ji xwe re kiribû bi cih nehat. Wî ci xistibû xeyala xwe? Digot: "Ezê lêxim, bikujim, birevînim û di roj û şevezî de PKK ji meydanê rakim". Lê hema li dawiyê dît PKK û serokatiya PKK ê ci temsîl dike!

Me di van çend salên çûyin de, plana ku dijmin ji xwe re danibû, xirab kir, amadekariyên ku dikirin me hilanîn. Dijmin nikare mîna berê serhildanan hilîne, nikare şer bide sekinandin, yanî tiştê ku neyar dixwaze bike, nikare bike. Ne weke berê ci demê bixwaze qir bike, em li vir dîrok û qehremaniya partiyê dibînin, dîroka partiyê ev e.

Bi rastî yekî ku di vê demê de li bûyerên dibin bîmêzîne, wê bikaribe bizanibe tarîx ci ye, berê tarîx ci bû, di PKK de dîrok tê ci wateyê? Ji bo ku em bersiva van pîrsan bîdin jî divê em PKK baş nas bikin û dijmin jî baş nas bikin. Pişî ku dijmin dît nikare meşa me bide rawestandin, ci kir? Cûn dosten xwe dîtin.

Berî ku bi ser me de werin çûn li ber lingê dînyayê geriyan. Demirel çû Emerika, li wir got tu nêzîk nebe, ez dixwazim bi ser herim, yanî bi ser me de were, ez dixwazim wan bi yekcar hilînim. Çû Ewrûpa, Almanya. Kî çû Almanya? Yekî Kurd heye, xayîmekî mezîn e, İdrîs Bedlîsiyekî nuh e, dibêjinê Hikmet Çetin, got em dixwazin demokrasiyê bimeşîni, alîkariya me bikin. Piştre çû İranê, got em Misilman in, PKK komonist e, em dixwazin wan komonîstan hilînin, ew hem zîrârî digihînin me û hem jî digihînin te, ji lewre em dixwazin hilînin, ji bo hilanîna wan alîkariya me bikin. Em dixwazin demokrasiyê çêbîkin, lê hema bîlayek li pîsiya me heye, divê were hilanîn.

Vê dema dawiyê jî çûne Diyarbekirê. Gotine gelê Amedê, em we qebûl dîkin, guh bîdin me Kurdino! Em dixwazin, alîkariya we bikin, şefqeta me ji we re, em dixwazin rehmî li we bikin, lê hema li pîsiya me kelemek heye, daxwaza me ji we ew e hûn xwe ji PKK ê bi dûrxin. Ev ci şefqet e?! Bi dehan kesen welatparêz kuştin, hemû tanq û topê xwe kişandin Kurdistanê, terora ku di meşîni hîna tu caran nehatîye meşandin, rehmet ev e?! Şefqeta sexte û ya ku mirovan dixapîne, lê hema em nayêne xapandin.

Niha ci dike? Bi navê xwedê, bi navê pakiya xwedê, kuştinê, lêxistinê, terorê, tîrsandinê li dijî rewşenbîr û xwendevan û gîrsen gel çêdike. Şerî dizî yê gelekî bi tehlîke ev e.

Dagîrkeran xwestin berî Newrozê vê mesela me biqedînin, eger neqediya jî di Newrozê de dawî pê bînin. Hesabê wan ev bû, di van çarpenç mehîn çûyin de bi vî ruhî bi ser me de hatin. We dît bi ci hovîtiyê li Şîrmexê, Nisêbînê, Cizîra Botanê xis-tin.

Planeke din li pîsiya dijmin heye. Dizane gel ji PKK qut nabe, dizane êdî gel ji mirînatirse, sînga xwe didin ber devê tanqan, di bin panzeran de diçirin, meşa wan meşa egîdiyê ye, meşa qehremaniyê ye, meşa PKK ye! Ew



Serokê ERNK Abdullah Öcalan

● Edî tiştîk di destê dijmin de nemaye. Ji ber vê yekê dest davêje Kurden xayîn. Li aliye kî dest davêje wan û li aliye din bi tanq û topê xwe êrîsi me dike. Lewma dijmin werin ji xwe re partiyekê çêbîkin. Werin Kurdino, Kurden reviyayî, em tade li we nakin, werin bibin berpirsiyaren partiya xwe, ev partî ji bo we ye. Xeta dijmin wiha ye, bimeşî nemeşe, çêbîbe çenebe, ev plan daniye ber xwe

levîzyon, ji we re partî... hûn Partiya dijmin çêbîkin, hemû tiştîn hûn dixwazin hazir in. Plana li pîsiya dewletê niha ev e."

Vê dawiyê bangî Barzanî û Talabanî jî kir. Got, werin li şûna PKK partiyekê din damezîrin, dixwazin partiyekê Mîtê çêbîkin, Mîtê xwirt bîkin. Çûn li Tirkîyê bi hev re ev program danîn. Dibêjin emê PKK hilînin, bi hev re vê dibêjin. Ne tenê Barzanî û Talabanî, her wiha bang li yên Ewrûpa jî dike, dibêje wan jî werin; ji xwe re tiştîk çêbîkin, her tişt ji bo we serbest e, tiştîk ji bo we ne qede-xe ye, fîzna hemû tiştî ji we re heye. Bi navê Kurdayetiye ci dixwazin çêbîkin, çêbîkin. Partiyê dixwazin damezîrin, fermo ji we re destûr, hûn dikarin ji bo serxwebûn jî he-reket bikin, hûn jî bibêjin "Bijî serxwebûn", tenê şertekî me bi we re heye, hûn heye dawiyê li dijî PKK şer bikin, hûn li dijî serokatiya PKK bi dijwarî bisekinin.

Ji me re dibêjin; dev ji şer berdin, hûn jî dikarin weke ewen din siyasetê bimeşîni. Siyaseta ku ji me dixwazin ci siyaset e? Bê guman siyaseta teslimkariyê ye, siyaseta xiyanetê ye. Di hundîrê partiyê de jî xwestin vê siyaseta xwe bimeşîni. Provakasyona vê dawiyê jî yek ji plana dijmin bû.

Edî tiştîk di destê dijmin de nemaye. Ji ber vê yekê dest davêje Kurden xayîn. Li aliye kî dest davêje wan û li aliye din bi tanq û topê xwe êrîsi me dike. Lewma dijmin werin ji we re serxwebûn, ji bo serxwebûn bixebitin. Werin Barzaniyo, Talabaniyo!

Werin ji xwe re partiyekê çêbîkin. Werin Kurdino, Kurden reviyayî, em tade li we nakin, werin bibin berpirsiyaren partiya xwe. Lî hema em dijmin be, bila ne ji bo hilanîna PKK be, hûn vê jî nikarin bikin, xwe najone mirîn û li cihê xwe rûnê û dostaniya PKK bikin, hûn dikarin dosta-niyê bikin.

Kurdayetiye rast di vê demê de PKK çêkir. Dema berê Kurdayeti miribû, mirovîn Kurden miribû. Hêza ku ew Kurden mirî hişyar kir kî bû, yê ku jiyan peyda kir kî bû? Ma hûn nizanîn, na! Bê guman hûn baş dizanîn, bi ci qehremaniyê Kurdayeti afîn û bi ci egîdiyê Kurdayeti hate meydanê. Li dawîya wê qehremaniyê Partiya Karkeren Kurdistan bû partiya gelê Kurd û Kurdistanê. Eger hûn dixwazin çêbîkin, li ser siyaseta serxwebûn û azadiyê ya rastîn û li ser egîdiya ku tu caran îmkar nabe çêbîkin, hingê em dikarin alîkariya we jî bikin. Lî hema, dema hûn bixwazin siyaseta dijmin bimeşîni em berî her kesî li dijî we ne, bila haya we ji we hebe.

hûn Partiya dijmin çêbîkin, bersiva van pîrsan bidin gel. Eger hûn nedin tu caran heqê we tune hûn werin rojekê tenê li Kurdistanê bimîn.

We heya niha Kurdayeti îmkar kir, we xwe bi quruşan firot, we ji rehetiya canê xwe bêhtir tiştîk neda ber çavên xwe. Niha jî hûn dibêjin: "Em partî ne, PKK ne demokrat e, em demokrat in..." Kurden wiha ehmeq û xayîn, hûn ci ne û ne ci ne?! Hûn di nava gelê Kurd de ci temsîl dîkin? Gelo, hûn ji bo van pîrsan tu caran fîkîrin? Bi hêza dijmin, li ser xwîna şehîdan ci heqê we heye hûn xerabiya tewre mezin bikin? Bila hûn bizanîbin, di dîrokê de ji we xayîntir tu kes tune ye. Gel we wiha bernade, wê derbêne mirinê bîne ser we, hişê xwe têxine serê xwe, bifikirin. Em dîzin, Barzanî, Talabanî, Eme-rika, Ewrûpa alîkariya we dîkin, berî wan tevan jî dîwleta Tirk û Mît alîkariya we dike, alîkariya mirîn jî ev e. Eger hûn bi aqil bin, nekevine vê lîstikê, eger hûn rast welat-parêz in, xwe biparêz in û bila kesek bi we nekene. Dîsa em dibêjin, eger hûn dixwazin partiyekê çêbîkin, fermo damezîrin, lê hema bila partiyekê serbest be, bila ne partiya Mît be, bila ne girêdaye dijmin be, bila ne ji bo hilanîna PKK be, hûn vê jî nikarin bikin, xwe najone mirîn û li cihê xwe rûnê û dostaniya PKK bikin, hûn dikarin dosta-niyê bikin.

Kurdayetiye rast di vê demê de PKK çêkir. Dema berê Kurdayeti miribû, mirovîn Kurden miribû. Hêza ku ew Kurden mirî hişyar kir kî bû, yê ku jiyan peyda kir kî bû? Ma hûn nizanîn, na! Bê guman hûn baş dizanîn, bi ci qehremaniyê Kurdayeti afîn û bi ci egîdiyê Kurdayeti hate meydanê. Li dawîya wê qehremaniyê Partiya Karkeren Kurdistan bû partiya gelê Kurd û Kurdistanê. Eger hûn dixwazin çêbîkin, li ser siyaseta serxwebûn û azadiyê ya rastîn û li ser egîdiya ku tu caran îmkar nabe çêbîkin, hingê em dikarin alîkariya we jî bikin. Lî hema, dema hûn bixwazin siyaseta dijmin bimeşîni em berî her kesî li dijî we ne, bila haya we ji we hebe.

Hevpeyvînek bi Kurdê re

'Mêrên Kurd êsîrê jinebiyê Ewrûpî ne'

Navê te?

-Kurd e.

Bû çend salên te ku tu li
dervayî welêt i?

-Bû çar sal û nîv e ku ez li
dervayî welêt im.

Wekî jineka Kurd, xwedî
kultureke taybetî û adetên ji
yê Firansizan cuda, tu xwe
di civaka Firansizî de çawa
dibînî?

-Xwişka delal, mesela cihê
jina Kurd bi mesela Kurdistanê ve
girêdayiye, û mesela
Kurdistanê ji mesela jina
Kurd e. Zanayek dibêje: "Ger
tu bixwazî pêlana pêşketina
civakekê bizanibî li pêlana
pêşketina jinê wê binêre".
Cihê jina Kurd di civakeke
weke civaka Firansizî de, li
hêlekê, li gor zanebûn û
jîrbûna wê ye; û li hêla din ji,
bi rewşa gelempêrî ve
girêdayiye. Zimanê jina Kurd
weke yê mîrê Kurd qedexe
ye, welatê wê dagirtî ye, kul-
tura wê bi ya dagîrkerê Kurdistanê
re hatiye tevîshevkirin,
mêjiyê pîr kesan bi kultura
musulmantiya paşverû hatiye
şûştin. Û ev yeka hanê ji pîr
encamêr xerab derxistine
meydanê. Yek ji wan cu-
dabûna di navbera tîmarkirina
keçikê û kurik de. Vê cu-
dabûnê pîr kêmâni û qelsî di
kesîtiya jina Kurd de çandine
û pîr qûç (komek kevir) kiri-
ne riya pêşketina herduyan ji.
Wekî em û dinya tev ji di bin
siya civakeka patriyarkî (se-
miyantiya bavê) de dîjîn, ji
xwedê de bigre û di pêxember
û şêx û mele û keşş û serokê
dewletan re derbas be, tu wê
bala xwe bidiyê her tim nêr
bûne. Her tim ger ne bi ya
wan be ji, lê di bin siya wan
de cihê jinan di civakê de hati-
ye çêkirin. Ji ber vê ji, cihê ji-
na Kurd di civaka Ewrûpî de
ne dûrî cihê her kesekî rojhila-
ti di civaka Ewrûpî de ye.

Tu têkiliya navbera jin û
mîrê Kurd li dervayî welêt
çawa dibînî? Hêvîdar im tu li
vir bidî xwiyakirin ka kesîtiya
jina Kurd li pêş mîrê Ewrûpî
çawa ye. Gelo ma baweriya
wê bi wê heye ku wekî mîran
li pêş wan xwe bide xwîyan?

-Tu dizanî wekî min li jor ji
got, mixabin xweliya me li
serê dijminê me be wekî ku
xweliya xwe bi ser kultura me
de weşandin û teniya xwe ya
bi bez ji di riya Musulmantiyê
re di me dan. Ger em vegerin
pirtûka Bazîl Nîkitîn a ku tê
de li ser cihê jina Kurd di ci-
vaka Kurdî de nîvîsandiye,
tişten dane xwîyan ku serê mi-
rov bilind dîkin. Ne wî tenê
heya bîghê Minorskî ji ne
kêmî Kurdekkî pesna ev tişten
hanê daye. Baweriya min ew
e ku kesîtiya jina Kurd wê he-

Çi li welêt
ci li
Ewrûpa,
jina Kurd
ger tevli
têkoşînê
nebûbe,
tim di binê
nîrê mîr de
wek
koleyan
jiyan dike,
ne şeva wê
şev, ne ji
roja wê
roj e.
Tê xapan-
din xwe li
ber deriyan,
dibîne, ci-
hek tune
ku pê de
biçe, dema
ku ji xwe re
cihekî bibî-
ne ji, ji nuh
ve bi hezar
virr û dere-
wan tê xa-
pandin û
dadigere
hepisxana
xwe

Wêne:
Osman Kadîr



Jîyan kengê bêt destê jinan guherîye, kîjan şoreş bêt jin çûye serî, werin dest bidin şer-
vanen azadîyê, da ku hûn di avakîrina jîyanekî nuh de, di wekheviyê de bîglîhen hev.

be û li hember kê be ji wê
xwirt be. Yek, eger baweriya
wê bi wê hebe; dudu, ger ba-
weriya mîrê Kurd bi wê hebe
û bi destê wê bigire, wê bi
xwe re rake, bi çavekî kêm û
bê bawerî li wê nenêre. Bi go-
tina dinê, berî ku em li ser
hebûna kesîtiya jina kurd li
pêş mîrekî Ewrûpî bisekinin,
divê em cihê wê li kèleka
mîrê Kurd bibînin, ne li piş
wî. Serê mîrikî Kurd bûye
berîka xelkê, xelkê ci xistiyê,
ew tê de ye. Ji Erebîn Musul-
man de bigre heya tu digihêjî
komonistîn Yekîtiya Sovîti
ya kavil bûyî.

Tu kesîtiya mîrê Kurd li
dervayî welêt (li pêş jineka
Kurd û li pêş yeka Ewrûpî)
çawa dibînî? (mîrê Kurd li
welêt û yê li derve beramberî
hev bike)

Tu dizanî pîr kêm e ku
mirov bikaribe ji eyarê xwe

derkeve û bibe yekî dinê, lê
pîr caran rewşen di ser mirov
re derbas dibin hin dersan di-
dinê, hin caran zorê ji didin
ser wî û wî gêr dîkin. Hin
mîrê Kurd jîyan Ewrûpî li
xweşîya wan tê; hinê wan ba-
weriya wan bi jîna Ewrûpî
nayê lê tevî wê ji mixabin car-
na rewşa aborî û tunebûna cih-
yan hin problemen vir de-wê
de wan dîkine bin zora ku ji-
yan xwe bi yeka Ewrûpî re
ava bikin (li şûna ku bi yeka
Kurd re xera bikin!) û en-
camen dawiyê ji ew bi xwe
baş dizanin. Kurd dibêjin:
"Mirov dema serê wî li Kevirê
ezîzîyê dikeve, ew nuh şiar
dibe". Lî, a baş ew e ku
xorten me yê Kurd li dervayî
welêt ji hema hevdên sipî di
serê wan de pîr bûn, ew nuh
şiar dibin û keçikeke Kurd a
sêzdeh-çardeh salf ji welêt di-
kirrin û tînin di hundir de di-

derkeve û bibe yekî dinê, lê
pîr caran rewşen di ser mirov
re derbas dibin hin dersan di-
dinê, hin caran zorê ji didin
ser wî û wî gêr dîkin. Hin
mîrê Kurd jîyan Ewrûpî li
xweşîya wan tê; hinê wan ba-
weriya wan bi jîna Ewrûpî
nayê lê tevî wê ji mixabin car-
na rewşa aborî û tunebûna cih-
yan hin problemen vir de-wê
de wan dîkine bin zora ku ji-
yan xwe bi yeka Ewrûpî re
ava bikin (li şûna ku bi yeka
Kurd re xera bikin!) û en-
camen dawiyê ji ew bi xwe
baş dizanin. Kurd dibêjin:
"Mirov dema serê wî li Kevirê
ezîzîyê dikeve, ew nuh şiar
dibe". Lî, a baş ew e ku
xorten me yê Kurd li dervayî
welêt ji hema hevdên sipî di
serê wan de pîr bûn, ew nuh
şiar dibin û keçikeke Kurd a
sêzdeh-çardeh salf ji welêt di-
kirrin û tînin di hundir de di-

kin "kebanî". Jîyan bi "jine-
biyê" Ewrûpî re xewneka
şerîn e, bi keçikên Kurd re
rastiyeke tal e. Ev me
nimûnak ji hin mîrê Kurd di-
yar kir. Em nimûneyen dinê ji
bidin.

Mamosteyen me li welêt di-
bin girtiyen zindanen dagîrke-
ran û bi desten wan tene iş-
kence kirin; mal, can û
namûsa xwe ji bo welât xwe
dîkin qurban. De werin em
binêrin "Mamosteyen" me li
Ewrûpî ci dîkin? Yek ji van
"Mamosteyen" me li Ewrûpî
dibe dîlê dîlê porzerekê û bi
agirê evîna dîlê wê tê işkence-
kirin û mal, zarok û namûsa
xwe careka dinê di ber canê
vê canka nuh de dîde! Em
dibêjin careka dinê, ji ber ku
camer berê jinek li welêt biri
bû. Jîyan xwe ya pêşin bi çar
zarakan ve bi ser mala bavê
xwe de berdide û bi yeka ku

panzdeh salan ji xwe biçûktir
û bê dilê wê re dizewice. Ji
ber van sedeman, herdu berê
xwe didine Ewrûpî xopan; ca-
reka dinê Ewrûpî mala wî di-
ke xopan!

Dema qaşoyê me giha
Ewrûpî, welatparêzekî yeman
bû, di ber mafê jîna Kurd de
deyn dikir û şehîd diket, li ser
ziman û helbesta kurdî dixebeitî,
bi du'a û limêjên nuh ji bo
Kurdistaneka serbixwe difiki-
rî, digot: ev limêj û du'ayê
Musulmanan ji ne yêne re
Kurdan in û ne ji ji me re
bin. Li şûna "Allahû ekber"
digote keça xwe bibêje: "Kur-
distan mezin e"; li şûna "Mi-
hemed resûllîlah", bibêje:
"Xanî û Apo (Osman Sebî)
pêxemberen Kurdish in", li
şûna Heye ele el-fecir, Heye
ele el-selat", bibêje: "Rabin şî-
yar bin, li me bû dereng", li
şûna "Elhemdûllîlah", bibêje:
"Kurdistan zengîn e", hwd...
Keçka xwe ya biçûk her si-
behê radikir û nexşa Kurdistanê
pê dida ramûsan.

Malxerabê, ma porzera
Ewrûpî di dorê re neçû û ne-
hat, mamosteyê me hiş di sérî
de nema, bû navneteweyekî
dilovan û diltenik, êdî bi zi-
manê teyr û tilûran axivî, êdî
li ser mirovahiyê kezeba xwe
dişewitand.

Ji wê rojê û pê ve, mamos-
teyê me û jîna xwe ya Kurd li
hev bûne ar û mar, nema xîr
bi jîna xwe ya Kurd kir. Rûyê
xwe lê tal dikir, mîrantiya roj-
hilatî bêtir pê re gurr bûbû.
Pîr caran, bi çepîle wê digirt
û derê malê vedikir û digotê:
"Here, min te berdaye, hele ez
binêrim kîjan teresî te heye, tu
ji maleke bê exlaq û bê namûs
î, xalêne te, diya te..., min tu bi
nerazibûna te û zora diya te ji
xwe re anî, min gote xwe ku
ew panzdeh salen ferqa di nav
bera temenê me de wê bihelin
ku ez te ji xwe re tîmar kim, te
bi hevîr kim di nav destê xwe
de, bistirêm, te weke bixwa-
zim bikim, va sê-çar sal in ew
cefaya min li arê çû, ezê bi
girêka hevîrê xwe bigirim û li
dîwîr xim, ez şekala eva Fi-
ransizî bi riyê bay û bapîrên te
nadim... Kurt, "mamosteyê"
me xwest li porzera Ewrûpî
"siwar" be, rabû, du xwîlî li
serê xwe kirin: yeka sar, por-
zera Ewrûpî ji "bin" mîr bir;
yeka germ, keçka xwe sêwî
kir û jîna xwe berda. Pê re,
"mamosteyê" me rabû koka
malbata porzerê kola, tamare-
ka "Kurd" tê de dît û got: "Ji-
nik Kurd e"!.. Digo: yekî
xwest guhêne kera xwe bixwe,
gote xwe: weylo, guhêne kera
min ci guhêne kîrgoya ne!

Hevpeyvîn: Zîna Şikakî

Di dîroka civatan de mirovahiyê gelekî eziyet û stemkarî dîtiye. Di her çax û demê dîrokê de dewlemend û zordaran, ji bo berjewdên (menfeetên) xwe tade û zilm li mirovahiyê kirine. Zordestiya çînayetî û zordestiya neteweyî, di van du-sê sedsalên dawî de gelek belav, berfireh û sistematik bûye. Zordestiya neteweyî, wek ku di van heftê salê dawî de hate dîtin, dikare di formekî nîjadperest keve, misyonekî hov hilgire û gelekî xwîn bê herikandin. Heger nîjadperestî di sîstema siyâsî de cih bigire yan jî nîjadperest îqtidarê bi dest xwe xin, neyartî dikare girs be û eziyeta li ser mirov û neteweyan hîn jî hovtir be. Nimûne di vî warî de pîr in. Sîstema Mussolini, Hitler, Franco û Pinoçev çendek ji van in.

Mirovahiyê, di dîroka xwe de pîr zehmetî dîtiye û xwîn rijandiye. Emperialist di koloniyên xwe de û di herdu şerîn cîhanê de bûne sedemê xwîn rijandinê. Sipiyê Ewrûpa Amerika dagîr kirine û çermesor kuştine, dûre Efrîka dagîr kirine, hînek reşik di cih de hînek jî ji xwe re birine mal û li wir kuştine. Dûre dest avêtine Asya, gelek mirov, bi taybetî ji Vietnamê kuştine. Mirov dikare di dîrokê de ber bi paş here û behsa Napolyon, çaxa dîldarî (koletî), hovîtiya Kîlîsî û Împaratoriya Rom û yên din bîke. Heger mirov ber bi pêş here û dîroka van çend salê dawî û nuh binêre, şerî Iran û Iraqê, şerî Xelîcê, şerî Yûgoslav, şerî di navbera Ermenî û Azeriyan ji

Kurd wê bi dengê xwe yê bilind bêdengiya cîhanê bişkînin



Kurd li welatê xwe her roj tene kuştin. Kurdistan bûye meydana xwîn rijandinê.

çend nimûneyen kuştin û xwîn rijandinê ne.

Gelê Kurd jî di vî warî de bêpar nemaye. Di şerî navbera Fars û Osmaniyan de gelek Kurd hatine kuştin û welatê Kurdish bûye arena xwîn rijandinê. Ji şerî cîhanê yê yekemîn û heyâ tro li her perçê welatê me dagîr-

keran bi sed hezaran mirov me qetil kirine. Kurd, li Koçgirê, Piran û Amedê, li Ararat, Dêrsim û Mehabadê, dîsa li Amedê, li Şirnax, Nisêbin û Cizîra Botan, li Helebce, bi kurtî li her deverê Welêt, hatine kuştin. Dewleta Tirk û dewletê din yên dagîrker hovîtiyên xwe bi me-

todên cûrbecûr nîşanê cîhanê da-ne.

Heger mirov li vir gelên cîhanê û gelê Kurd di aliye vext û hovîtiyê de muqaseye bike mirov dikare bi kurtî bibêje, him dijwariya hovîtiya dagîrkerên welat gelek girs bûye, him jî qet neteweyekî cîhanê ewqas sed sal

di bin koteka mêtîngera de ne-maye. İro li cîhanê neteweyekî bi qasî Kurdan asîmîle nebûye. Li cîhanê tu neteweyekî ji rewşa xwe bê xeber nemaye. Li aliye din iro, ji bilî Kurdan tu neteweyê ku welatê wî hatiye dagîr-kirin, tuneye. Yanê iro neteweyê ku xwedîyê welatê xwe nîne, tuneye. Reşikê Efrîka Başûr mabûn, ew jî rastî De Clarkê liberal hatin û dê di demekî kurt de bi xwe bikaribin xwe idare-kin, Di nav dagîrkerên welatê me de qet yekî wek De Clark jî derneket. Yek ji yekî xirabtir e. Hemû dijminatiya mirovahiyê dîkin. Van dewletana her tişt ji bo me qedexe kirine. Zimanê me qedexe bû, çand û nîvisa me qedexe bû, hemû nîrxê mirovahiyê ji bo me hîn jî qedexe ne. Hebûna gelê Kurd heta çend roj berê qedexe bû.

Li hember vê hovîtiyê gelek ji me Kurdan bê deng in. Çînê bindest û zehmetkêşen sistemên ku welatê me şîxal kirine, bê deng in. Hemû cîhan li hember hêzîn desthilatdar bê deng e. Di rewşeka wiha de bibe nebe çend gotinê M.Luther King tene bîra mirov. M.Luther King wiha gotiye: "Trajediya mezin ne stûrî û hovîtiya mirovên xirab e. Trajediya mezin bêdengbûna mirovên qenc û paqîj e."

Lê dîsa jî rastiye heyen. Ew jî bi kurtî Kurd bixwe ne. Încax Kurd bi dengê xwe yê bilind, bi bilindkirina têkoşîna xwe dikare bêdengiya cîhanê bişkîne.

M. Ali Tüysüz

Birano êdî bes e!

Kemal Sido

Birano bes e! Lazim e em xwe nexapînîn û fersendê nedîn tu kesî ku gelê me bixapîne. Dîroka gelê Kurd dîroka xwe xapandinê ye. Pêwîst e em fêmbikin ku xelasiya Kurdish tenê di welitekî azad û serbixwe de çedîbe. Temaşekin li hawîrdora xwe, bibînîn çawa gelên dînyayê serxwebûna xwe distînîn. Ma çîma hikûmeta Tirk alîkariya Tirkê Azerbeycanê dike û serxwebûna wan heq dibîne? Çawa komara Tirk leşkerê xwe şan-din Qibrise û "Komara Tirk ya Bakûrê Qibrise" ava-kirî heya niha pêwendiyîn (elaqet) wê yê diploma-tîk bitenê li gel TC hene? Ma Kurd jî ne mirov û insan in? Ma maşfî wan jî tuneye ku ew jî xwedî welat û al (beyreq) û dewlet bin?

Dîroka Kurdistana başûr (Iraq) gelek baş da diyarkirin ku otonomî, biratiya derew û kom-premîsîn bê prensip, mala gelê Kurd xirabkir û Kurdistan wêran kir, bi milyonan xelkê me bê av û nan hiştin û iro çavê gelê me li parsa dewletê mezîn e. Pirsa gelê me pirsa azadî û serxwebûna ye. Hin politîkvananê Kurd û bêgane (yabancı) dibêjîn

pêwîst e (gereke) Kurd çekên xwe deyîn û razîbîbin bi tiştên ku TC dide Kurdish û hêdî hêdî wê TC daxwazîn Kurdish temam bike, ta ku maşfî Kurdish giş bi cih bibin. Di vê xalê de ez dixwazîm pirsekî bikim: Kurdish Iraqê di vê riya han de ci bi serî-kirin? Yan jî generalên Enquerê ji yê Bexdadê bastîrin û dilbirehmtîrin? Hin politîkvananê din "şîretan" li hikûmeta Tirk dikin û dibêjîn: Eger TC prosêsa demokrasî pêşde bibe û fersendê bide

dema eskerên Tirk ji penaberên (ilticaci) Kurdish "Iraqê" re digotin: hûn hemû terorîst in, em ê we hemûyan bidin ber gullan. Eger em bi gotina wan bikin yanê gereke em hemû hevdû bîkujin. Ez hêvîdarim ku Kurd wê bi wan "şîretan" tu carî nekin. Şireta rast û durust ew e ku em hemû bibin yek dil û yek can û em xebata azadî û serxwebûnê gesbikin û ji wê riye qet derne-kevin. Kurd lazim e ji dîroka xwe tişteki baş fîr bin: kompro-mîs bi her kesî re û li ser her tiştî tene çekirin. Lê li ser hesabî doza azadî û serxwebûna Kurdish tan qet nayêن çekirin. Ew kes, yan partîyen ku karekî wisa bîkîn, ta herdem wê bîn guneh-

karkirin. Gotina birayê min Amed Tigrîs pîr û pîr rast e û di cihê xwe de ye dema ku di hejmara sîsiya, ya Welat de dîni-vîse ku: "Kurd hemû wek mîlet di gemîyekî de ne. Gemîya Welêt. Heger gemî nenoq bîbe, bin av bîbe, em hemû bi hevdû re bin av dibin, dixeniqin".

Birano! Hikûmeta TC ya nuh û kevin wek hev in. Di pirsa Kurdî de ew qet ne hatine guher-tin. Ma TC qetîfama Ermenîyan gunehkar kir? ma qatîlîn Şêx Seîd, Seîd Rîza... hatine guneh-karkirin? An ji bo biratiya gelan ev tişt ne lazim e?

Birano bes el Lazim e em xwe nexapînîn û fersendê nedîn tu kesî ku gelê me bixapîne. Dîroka gelê Kurd dîroka xwe xapandinê ye. Pêwîst e em fêmbikin ku xelasiya Kurdish tenê di welitekî azad û serbixwe de çedîbe. Temaşekin li hawîrdora xwe, bibînîn çawa gelên dînyayê serxwebûna xwe distînîn

partîyen Kurd yê "demokrat" wê partiya "terorîst" bi xwe û gelekî zû bêkes bîmîne û wê têkeve izolasyonê. Bi vê yekî ew dixwazîn Kurdish "Tirkîye" yê bi xwe berdin hev û şerî bîrakujî bixin Kurdistanê. Kuştînîn leşkerên Tirk li Kurdistanê ne bes in, ew dixwazîn bi serêfîn TC ve, Kurd Kurdish bîkujin. Ez dixwazîm ji wan "politîkvanan" bipirsim: ma terorîst çendin, sed, hezar, dehhezar...? Eger li gor generalên TC be Kurd giş eşqîya û terorîstîn, ne tenê Kurdish "Tirkîye" yê lê belê Kurd bi temamî. Baş tê bîra min

karkirin. Gotina birayê min Amed Tigrîs pîr û pîr rast e û di cihê xwe de ye dema ku di hejmara sîsiya, ya Welat de dîni-vîse ku: "Kurd hemû wek mîlet di gemîyekî de ne. Gemîya Welêt. Heger gemî nenoq bîbe, bin av bîbe, em hemû bi hevdû re bin av dibin, dixeniqin".

Birano! Hikûmeta TC ya nuh û kevin wek hev in. Di pirsa Kurdî de ew qet ne hatine guher-tin. Ma TC qetîfama Ermenîyan gunehkar kir? ma qatîlîn Şêx Seîd, Seîd Rîza... hatine guneh-karkirin? An ji bo biratiya gelan ev tişt ne lazim e?


XAÇEPİRS

Amadekar: Rasto Zilani

Çepeast:

1-Dîlîn zin-danan û gelê me li hember zor-dariyê di-kin/ Mak, dayîk 2- Ki-rina komed-yenan/ Ba-weriya dînî 3- Tûrikê nanê şiva-nan/ Cele-bek rûn 4- Sembola 10

1	2	3	4	5	6	7	8	9	10	11	12



perê Almanan/ Merd/ Celebekî cetwelan 5- Pergaleke müzîkê/ Celebekî çivîkan (şahîn) 6- Naskirin/ Notayek 7- Curekî culxê (qumaş) ji hîrî çedîbe/ Xeîsekî misilman 8- Bi îngîlîzî na/ Rewş 9- Melodî, aheng/ Notayek 10- Servanekî PKK ê, di sala 1982 an de li zindana Amedê şehîd ket, di wêne de tê dîtin Serejêr:

1- Herêmekê li welat 2- Kul, xem/ Kesê ku dewamî tiştekî dikire (domdar) 3- Bazdan/ Sembola Dewletên

Yekbûyî yê Amerika/ Cînavka kesane yekemîn pîr-hejmar 4- Kwendekar, zana/ Çekirin 5- Ew, ewana/ Kûrahiya di çîyan de, cox 6- Sembola Dewleta Misirê/ Sembola Nîobîmûmê/ Notayek 7- Olperestî/ Ji bo ifade-kirina tarîxekî dûr tê gotin 8- Xwarin û vexwarina bi gişkî/ Hejmarek 9- Rojde-mek 10- Notayek 11- Bizina yek salî, tişîr 12- Bi alikari-ya hînek pîrsîn taybetî di derheqê tiştekî dezanîn ci-vandin

BERSİVÎN XAÇEPİRSA HEFTİYA ÇÜYİ:

Çepeast: 1- Amade./ Nelson. 2- Zana./ Mela./ Sî. 3- Ane-min./ Alim. 4- Dekan./ Sm./ Far. 5- Soranî./ Şano. 6- Ren./ Derî. 7- Do. 8- Jmartin. 9- Eg./ Dêmar. 10- Tir./ Na. Serejêr: 1- Azad/ Rojev. 2- Manese./ Mg. 3- Anekonda. 4- Damar./ Ordî. 5- İnad./ têr. 6- Mn./ Nedîm. 7- Ne./ Sîr./ Nan. 8- Elam./ În./ Ra. 9- Lal. 10- İfa. 11- Osman. 12- Nî./ Ro.

NEQUŞKAmadekar
Aram Çem

Qurbanê ji celadê xwe re
hurmetê dike, ez jê nefret dikim
Jean - Paul Sartre

Ali Sirmen û APO

Revokê astîxwaziyê Ali Sirmen
pirr bi këf e. Ji këfa re wexta
bifire. Tu dibê qey hêlinêk bi
duwazde çelikan ve ditiye. Ji
këfa re navê nivîsandina xwe jî
"Tu sax bî Apo (Sağolasın
Apo)". daniye.

Gelo ci bûye, ci qewimiye
ku Ali Sirmen wilo këfxwes e?
Kundê qorziyan, Sirmen di
rojnameya Milliyetê de li ser
çend gotinê Apo disekine. Di
nivîsandina xwe de, dibêje,
"Apo, televîzyona bi Kurdî
naxwaze. Lewra armanca Apo,
ne xwenasiyê Kurdan e, heqên
çandiniyê ye, di nav xweşiyê
de jiyan e û hemû azadiyê û ji
heqên demokratik fêde bibinîn
tade nebînin e."

Gelo Ali Sirmen çawa tê
derxistiye ku armanca Apo
wilo ye? Sirmen di nivîsandina
xwe de (Milliyet, 25.5.1992)
gotinê Apo jî girtiye. Serokê
PKK, Apo wilo gotiye:
"Televîzyona bi kurdi ji bo
Kurdistanîyen ku asimile
nebûne, dewlet fikrîn xwe yê
zingarî têxe serê wan, difikirin.
Dewlet, dixwaze Kurdistanîyen
ku mîjîyên wan bi tirkî
neşûştîye, bi kurdi biço. Wekî
din jî, dixwaze ji dinyayê re
bêje, binêrin em tu ferqê naxin
nav Tirk û Kurdan, Kurd jî ji
hemû heqan istifade dikin. Bi
vî riyê jî dixwaze ku propagan-
dayênu ku li Ewrûpa li diji
dewleta Tirkîye dibe ji navê
rake. Armanca dewletê, PKK
bi tenê bihêle û ji xelkê dûr
bixîne."

Li ser van gotinê Serokê
PKK Abdullah Öcalan, Ali
Sirmen dibêje: "Apo televîzyo-
na bi kurdi naxwaze."

Ne hewce ye ku em binivîsi-
nin, bêjin; Ali Sirmen, PKK
tevgerek terorist dibîne.
Sirmen, Apo û PKK naecibîne,
dibêje ne ji bo heqên xelkê

Kurd mucadele dikin, ji bo
serokatiya xwe û ji bo civatek
li ser terorê ava bibe xebatê
dikin.

Ez dixwazim ji Sirmen bipir-
sim: "Gelo xelkênu ku bi sîh



hezaran, bi pêncî, şest, heftê
hezaran rabûne ser linga û li dû
ala PKK û sûretê Apo dimeşin,
ci kes in? Ci bi wan hatiye ku
xwe davêjin nava agir? Gelo
xwîna wan ketiye çavê wan,
yan dîn bûne? Gelo terorist û
ne teroristên Tirk kengê bi
hezaran însan dane dû xwe û
îro gelo karin bidin dû xwe? Ev
çawa hezjekirin e ku bi hezaran
bi sed hezaran mirov bi navê
Apo radibin û rûdinê?

Ma kî xeşim maye, kî nizane
ku fro ku qala Kurdiyê dibe,
qala televîzyona bi Kurdî dibe,
giş bi xêra ew tevgera ku
Sirmen û nijadperestên wek wî
ku dibêjin "terorist" e. Ku fro
em bi zimanê xwe li kaseta
guhdarî dikin. Rojname û
pirtûkan derdixin, em zanin bê
em çawa gîhane vana? Ne
Kurd tenê, Tirk jî ji têkoşîna

wan terorîstan fêde dibînin.
141,142 û 163 bi xêra têkoşîna
wan kesan rabû. Ku îro piçek
demokratik heye û çepen
Tirkân di firehiyê de ne, tevde
bi hunera PKK ê ye.

Bila Ali Sirmen nekeve tayê;
wê televîzyona bi Kurdî ji
çêbibe. Wê dewlet bi zimanê
Kurdî mekteban jî veke. Wê ji
mecbûri gelek heqan nasbikin.
Lê ne bi xêra dê û bavê xwe wê
van heqan bidin. Wê ji mecbûri
û ji neçarî bidin. Wê bi xêra
camêrên serê çiya bidin; lê ne
wek camêrân wê bidin.

Apo ne li diji zimanê Kurdî
ye, ne li hemberê televîzyona
bi Kurdî ye. Bila dilê Ali
Sirmen têkeve cih. Ma Apo
kulibî ye, aqlê xwe winda
kiriye. Em dijminê nedemokratik
ne, em dijminê hovitiyê
ne, em dijminê zilm û zorê û
tadê ne. Em dijminê riyên
nerast in, fikrîn kevnoperst
û nijadperestiyê ne. Em jî Apo jî
wekheviyê dixwazin. Em tevde
zanin ku dewleta te ber bi
qenciyê ve gavekê bavêje. Wê
camêr hezar gav bavêjin.

Ali Sirmen dibêje ku dewlet
heqê Kurdan bide, demokratik
be, wê PKK û Apo roj bi roj
bihelin û qels bikevin wê
winda bibin.

Bila Ali Sirmen û ên wek wî
baş zanibin; em Kurd dostê
xwe û dijminen xwe ji hev
nasdikin. Çavê me jî vebûye.
Kesi nezan û di xew de
nemaye. Ku dewlet zimanê me
nasbike, heqên me nasbike,
wekheviyê têxe nav hemwela-
tiyên xwe, zor û zilmê ji ser
Kurd û Tirkân rake û bibe
demokratik; emê ji xorîn xwe
re, camêrên xwe re dua bikin û
emê bêjin, "Hûn her hebin,
Xwedê kêmâniya we nede,
mala we ava be û hûn sax bin."

Dicle Ferad

"Xeletiyek çêbûye, hina ew
tehrik kiriye"

Demirel

"Ev rezalet e, şerm û kirêt e"
Giş Rojnaman

"Kurdan zora Mandela bir...
Qerara Mandela Enqera
ecêbmâyî hişt"

"Tişte em jê ditirsiyan û me
hesab jê dikirin hat serê me.
Pirsa Kurdan navneteweyî dibe
wek ya Filistîn û Ermeniyân"

Yalçın Doğan

"Nelson Mandela lingên
hikûmetê xiste solêk teng"

Rojnameya Hürriyet

"Mandela terorist e.
Teroristekî kevn e. Ew li ku û
xelata Ataturk li ku"

"Ew kî ye, bezê bin guhê
bavê wî ji ku ye û gihaye ku,
ku xelata Ataturk qebûl neke"
hehhhe"

Emin Cölaşan-Hürriyet

"Me digot qey ew ji
tiştek e, ci tiş û ci hal"

Oktay Ekşi-Hürriyet



TİR

Musa Anter

Paleyâ pûş

Pirseke me Kurdan heye, însanên ku bê mane û fêde dike
firferit em ji wan re dibêjin filankeso paleya pûş dike, an ji
palê pûş e. Pûş sapê bê simbil e, tu çiqas gêre bikî, ka ye li ber
bayê diçe.

Ez niha dinerim hikûmeta Tirkîyeyê an jî li gor gotina wan
hikûmeta Silêman Demirel ci paleyî kiriye û ci zad hilaniye. Mêrik
rabû ser xwe ez nizanim kê dixapîne, go êdî em bûn Dewleta
Muazama, yanî em bûn dewletek mezin. Axa me ji behra
Adriyatîkê heta behra Çinê dom dike, nifûsa me 180 mîlyone, ma
êdî wê kî xwe li ber me bigre, em bûn lehî û ketin dînyayê. Go,
ku hinek eleqa xwe ji Tirkân bînîn yanî ji Azerbaycan û
Nexçîwanê, ezê quba ezmân daxînim erdê. Wextê ku ev di
televîzyonê de got xwedê şahid e tabireke me Mêrdîniyan heye
min ji re gotibû "uzrût". Dawî me nêrî ku du mîlyon û nîv Ermenî
bi qirika 180 mîlyon Tirkân S. Demirel girtine û devê wan di erdê
de difirkinin. Jê re gotin, ma tu çîma deynakî beg efendi? Ne te
digot ezê ezman daxînim erdê! S. Demirel bi wî tebîtetê xwe yê
eyarfîreh got: Na heyran ma em karin dest bidin Ermeniyan,
dinya li pişta wan e. Ê ma Silo wê ji te re nebêjin ma te berê ev iş
nizanibû, erê tu li ber xwe nakevî, ma tu li ber xelkê Tirkîyê jî
nakevî, ku tu me fedîkar derdixî. Ev yek, ya duyemin bi hela hela
Türkeş jî da kîleka xwe, yanî Türkeş Turancî ye, bir Turanî jî
xwe re kir beyreq. Ka ew çûna te bû ci Silo? Hê tu li wir bûyî
Qırxizan bi qirikên hev girtibûn. Tu hatî Azerbaycanê ji alîkî de
wan li hev dixist, ji alîkî de jî Ermeniyan li wan dixist. Te rahişt
şewqa xwe û tu revî revî hatî. Bû ci? Wekî dir jî ev pênc şes
meh in te wextê xwe bi merasiman, bi seyehetan derbas kiriye.
Çûna we ya Amerîka Tirkîye rezil kir, tu çûyi Asya Navîn kumê
me ji serê me ket, xelkê gûribûna me dît. Te merasima "Anaya
Mahkemesi" çêkir xeberdana te û ya Serokê mehkemê li hember
hiqûqçiyen dînyayê em rezil kirin. Niha jî wek van rojan ji Ecevît,
Türkeş, Coşkun Kırca re dibîn Enwer Paşayê biçûk. Çavêne te
lê ye ku tu jî bibî Ataturk biçûk, ku tu "İzmir 3. İktîsad Kongresi" li
dar dixî. Tu jî zanî û ez jî zanî, tiştek ji kongreya te jî dernake-
ve. Dawî keçika te Çiller ci bêje wê ew be. Çiller feqîr jî pirsek
Tirkan heye dibêje: "Doluya koyuyorum alımıyor, boşa koyuyorum
dolmuyor" yanî ez dikim a tije narê, ez dikim a vala tije nabe.
yanî jînîk dibêje ekonomiya me paleya pûş e.

Ez ji bedêla te bû ma, minê dev ji vi işî berdaya. Ma işe ku
mirov nizanibe û li xwe bike bela! Ma yabo çend car berdan te?
Ma tu li hetikandinekî din digerî? Em li ber te nakevin, lê bi te re
em jî dişewitîn. Beş e kuro. Palê pûş!

ye. Du mehkeme hene eskerî û
sivîl"

"Her sibeh mektebên me bi
Türküm, doğruyum vedibin û
televîzyona me pişti şevê bi
merasim û alîn eskerî tê girtin"

"Ma em karin bêjin ev
nişanen idareyeke demokratik
in?"

"Ne mebûsa xanim ji
Holanda, ne mebûse
Luksembûrgê û ne jî Mandela
bawer nake"

"Dev ji qurnaziyên erzan
berdin... Sala bê, kes vê xelatê
qeblînakê"

Cetin Altan
15.5.1992-Sabah

"Îmkân hebû em skandal
Mandela bisekinin. Belê ez
reya xwe ya şexsî bêjim ev
skandal îsal çenebûya wê
saleke din muhaqqeq çêbûbûya"
Nevzat Ayaz

Di dîroka Kurdistanê de meha Hezîranê

Weke hemû mehê Kurdistanê meha Hezîranê jî cihêkî pîr bi nîrx digire. Qirkirina Dêrsim di meha Hezîranâ 1938 an de bi şeweyekî pîr hov berdewam dikir, doliveriya Tirk çekêkî kîmyewî bi kar dihanî û bi nefte û agir mirovîn Kurd qetl dikirin.

Di sala 1925 an de pişti ku şoreşa Şêx Seid têk çû, rejîma Tirkîye di 27'ê meha Hezîranâ 1927 an de li hemberî serhildanênuh, qanûnek çekir û bi vê qanûnê Birêvebirê gelempêri (Genel Mûfettişî) anîne ser kar, da ku serhildan biperçiqinîn.

Di sala 1947 an de pişti hilweşandina Komara Mehabadê, Mustefa Barzanî bi 500 kesî re di meha Gulanê de dest bi meşê kir û pişti 52 rojan, di dawiya meha Hezîranê de giha ber sînorê (tixub) Sovyetê û piştre penaberî (iltica) xwest.

Selahattin Kurutuz di roja 1'ê Hezîranâ 1981 an de û Ahmet Taner jî her di vê mehê de li zindana Amedê şehît ketin. Kurutuz ji bo ku rejîma hov protesto bike xwe bi dar vekir û Taner jî bi îşkencê hate kuştin. Şêx Mehmudê Berzencî ji bo ku şerê Kurdan li dînyayê bide nasandin û yarmetî (alîkarî- piştgîrî) wergire, di roja 10 Hezîranâ 1923 an de nameyek şandibû ji rejîma Sovyetê re. Di vê nameyê de bala wan dikişand ser têkoşına gelê Kurd û hovîtiya îngîlizan. Berzencî, li benda heyetekê bû ku Sovyet bişîne Kurdistan, da ku ew raporan binivîsinîn.

Şafrê bi nav û deng, şorşerî mezîn hozan Qanî di 7'ê Hezîranâ 1965 an de çûbû ser heqîya xwe. Ew ji başûrê Kurdistan ji navçeya Şerezor bû û mirovîkî bê tîrs bû, evîndarê welatê xwe bû.

Şehîdên meha Hezîranê yên li jî riya gel ji bo serxwebûn û azadiyê ronahîtir dikin. Irfan Genç (5.5.91), Şînasi Şans û Mehdi Bulut (7.5.91), Rindê Latifecî (8.5.91), Genco Atlî (14.5.91), Recep Tekin û M. Ata Aslan (5.5.1987), Seyfettin Özzen û Ahmet Çalîşkan (8.5.1985), Alaa-tin Zogurlu û Mehmet Dağ (11.5.87), Tacettin Arat (13.5.86), Mehmet Ağaa-slan (20.5.85). Berxwedana Eruh û Şîrvanê bi lehengîye ke mezîn kete dîroka gelê Kurdistanê li wir gelek leşkeren neyar bi mirinê hatine cezakirin (1985).

Bi ci rengî "Kurdistana Sor" hate damezirandin û hilanî?

● Di sala 1926 an de hejmara Kurdên li Kurdistana Sor a hâfî hilweşandin, gîhîstibû nêzîkî 42.000 kesan. Di sala 1979 an de jî Azerbeycanê bi şeweyekî fermî diyar kir ku li ser axa wê Kurd tune ne. Pişti guhertinê li Sovyetê çêbûn ramana gelê Kurd jî bi pêşket, hişyarbûn çêbû û nêzîkî 15.000 Kurdên li Azerbeycanê nifûsên xwe şewitandin, ji ber ku di wan nifûsan de ew azerî dabûn xwiyakirin

Prîskê Mihoyî

Li ser Kurdistana Sor xwendevanê me kêm tiştan dîzîn. Ji ber ku ew ji Kurdistana me ya rengîn û delal cuda hatibû çêkîrin. Ew ji bo wan Kurdên Yekîtiya Sovyeta berê hatibû ava kirin, ên ku hêja di dema Şah Ebbas de ji Kurdistanê hatibûn koçbarkirin û li ser axa Qafqasê niştecih bûbûn.

Pişti şoreşa Cotmehê (Oktoberê), di sala 1923 an de bi haydarbûna Lenîn ji bo wan Kurdan Otonomî hate çêkîrin.


Axa vê komarê (Kurdistana Sor), di navbera Qerebaxê û Ermenistanê de ye, paytexta we Laçîn bû.

Li ser dîroka Kurdistana Sor, di van çend salêن dawiyê de pîr nivîs bi zimanê cihêcîhê di rojname û kovarê Yekîtiya Sovyetê ya berê û yê din de hatine weşandin. Lî pirtûkeke pîr hêja û girîng he-ta roja frôyîn maye, ya ku di bin navê "Kurdên Azerbeycanê" de, di sala 1932 an de li Bakoyê derketiye. Xwedanê pirtûkê A.Bükşpan e. Di vê pirtûka xwe de ew bi dorfirehî li ser dîroka Kurdistana Sor disekine, her wiha li ser tiştîn din jî di pirtûkê de nivîsiye. Em, hînek gotinan ji wê pirtûkê li jîr ji bo xwendevan pêşkêş dîkin:

"...Tixûbên Kurdistana Sor, ji bakûr ve ji çiyyayê mirovdaxê ve dest pêdike û digihêje navçeya Gêncê. Wisa jî sînorê wê girêdayî Ermenîs-

Kurdên li Kurdistana Sor a hâfî hilweşandin, gîhîstibû nêzîkî

Tiştîkî eşkere û diyar e, we-tî hilweşandin, gîhîstibû nêzîkî kî di Azerbeycana Sovyetê de 42.000 kesan. Di sala 1979 an de jî Azerbeycanê bi şeweyekî heyânî niha, di bin ala komofermî diyar kir ku li ser axa wê nîzmî de bîr û baweriyê Pan-Kurd tune ne. Pişti guhertinê li Sovyetê çêbûn ramana gelê Kurd jî bi pêş ket, hişyarbûn çêbû û nêzîkî 15.000 Kurdên li Azerbeycanê nifûsên xwe şewitandin, ji ber ku di wan nifûsan de ew azerî dabûn xwiyakirin. Li vê derê pirsekî derdikeve pêsiya me. Ew frôyîn tê guhertin, Kurd ji xe-42.000 Kurd bi ku ve çûn? Ew wa sedsalan, ji xewa hingorê, 15.000 kesen Kurd ji ku hatin? ji xewa xwejibîkirin û xwe-



Nexşeya (xerîteya) "Kurdistana Sor" - Laçîn

Nelson Mandela

-Ji ber ku xelata Tirkî li wan regerand...

Her hebî mirovê hêja
Guh nedî pîs û keleja
Nehat lîstîka xwînreja
Her bijî Nelson Mandela

Emîr borand bi têkoşîn
Li herember gûrên dev bi xwîn
Fida kir xweş jîyan û jîn
Her bijî Nelson Mandela

Wilo xelat dûrî te bin
Ber ji Luns û Evren re bin
Ew herduk bi gorî te bin
Her bijî Nelson Mandela

Tirkî û Efrîka Başûr
Tu car ji hev nebûne dûr
Te şikand ew desten bi sur
Her bijî Nelson Mandela

Xwîna Kurdan dirjinin
Xelk û alem wan dibînin
Divabûn te bixapînin
Her bijî Nelson Mandela

Rûyê wan i qebîn û res
Te derêxist holê ci xweş
Te yek li ber wan kire şes
Her bijî Nelson Mandela

Ji gelê bindest re şerîn
Babetê kotek û dêrîn
Te dit ku ne merdemêr in
Her bijî Nelson Mandela

Tu aşîlxwazê bi rastî
Gula mirovîn bindestî
Ji Jir Dilovan re dostî
Her bijî Nelson Mandela

nasnekirinê hişyar bûye û de-wa mafê xwe yê bi heq dike. Şewq û semala şoreşa Kurdistana "dê" iro avêtiye wan koşeyen dînyayê û li kîjan derê Kurd hene di bin wê şewqê de jîyan dîbin.

Kurdên Laçînê jî, di van çend salên dawiyê de, berxwade-neke hêja pêkanîn, ew jî ji bo ku xwedî li mafên xwe yê windabûyî derkevin.

Li Kurdistana Sor, rojnameyek bi navê "Kurdistana Sor" dihate weşandin, dibistanên Kurdi hatibûn vekirin, radyoya Kurdi hebû, mamoste hatibûn amadekirin.

Pêwîst e em li dawiyê bînîn ziman, ew komara ku gelê xwe serbest û pêşketî dihesibîne, divê rî li pêsiya gelên di nava xwe de veke, da ku bikaribe bi serfirazî jiyana xwe bidomîne. Ger ev tişt tune be, mafê gelê bindest heye berxwedan û têkoşînê pêk bîne, bi ci awahî dibe bila bibe...

Jir Dilovan

Çend deyîrê ma...

Mi nê deyîrê cêrênî dorma-redê Pîran ra arê kerdi. Deyîra "Giro, Giro, Dayê Girono" yew deyîra zerrî ya û min hezey vatişdê yew Pîraniyî nuşta.

"Hevali" yew deyira xusu-siya veypvan a. Na deyîri çaxo-ki veyek hewlenenî, vanî. Tayn vatey Kurmancî (Kirda-sî) na deyîri di estî. Gelek varyantê na deyîri estî. Min na "Hevali" hezey vatişdê yew ceniya Pîraniyî nuşta.

Deyîra "Hene" zî ceniya çaxo-ki veyeki hene kenî, vanî. Na deyîri zî hezey vatişdê yew cenêkda Pîraniyî nusya-ya.

Hevali
Ex lê, lê, lê, lê delalê
Gewrê rindê çav xezalê.

Ina delalay m' ci bermenâ?
Ina delalay m' ci bermenâ?

Qewm şérîn o, dest nêkena.
Qewm şérîn o, dest nêkena.

Heznê dayk û bawki kena.
Heznê dayk û bawki kena.

Serê dewdey ma leyek î.
Binê dewdey ma leyek î.

Zava rind o, buk birinc o.
Zava rind o, buk birinc o.

Daykay zomay bew tebero!
Daykay zomay bew tebero!

Veyve ome berî ver o.
Veyve ome berî ver o.

Zomay ray ki bonî ser o!
Zomay ray ki bonî ser o!

Leblebo deki mundî ver o!
Leblebo deki mundî ver o!

Hene
Wer hene, wer hene, hevaley.
Wer hene, wer hene, delaley.

Hêne bi heney gonî, hevaley.
Hêne bi heney gonî, delaley.

Ona destê şonî, hevaley.
Ona destê şonî, delaley.

Wer hene, wer hene, hevaley.
Wer hene, wer hene, delaley.

Giro, Giro, Dayê Girono
Hêgây golo xele bibînî.
Hêgây golo xele bibînî.

Îno lacek pale bibînî.
Îno lacek pale bibînî.

Eza kor sebaleçî bibînî.
Eza kor sebaleçî bibînî.

Serê kuça xewle bibînî.
Serê kuça xewle bibînî.

Min û lacekî yewno bidînî.
Min û lacekî yewno bidînî.

Îno roco cum'e bibînî.

Îno roco cum'e bibînî.

Pî mi comiyo cêrê bişînî.
Bawkê mi comiyo cêrê bişînî.

May mi qirniy mehla bişînî.
Dayka mi hetonî mehla bişînî.

Giro, Giro, Giro, Girono.
Giro, Giro, dayê Girono.

To ez kerdo qal û xeberî.
To ez kerdo qal û xeberî.

Rişêşê varonî varaynî.
Rişêşê varonî varaynî.

Lacek' bon' bawkê mi çarnay-nî.
Giron' bon' bawkê mi çarnay-nî.

To keno qirbonê zifqêrday be-ri.

To keno heyronê zifqêrday be-ri.

Waştay lacekî hanî ya Qileş (1) di.

Waştay lacekî hanî ya Qileş di.

Îno lacek şînî gonkêş di.
Îno lacek şînî gonkêş di.

Giro, Giro, Giro, Girono.
Giro, Giro, dayê Girono.

(1) Qileş: Yew dawa qezay Erxenî ya.

Arêkerdox: J.Espar



Rexnegiri ^ kultur

Kurdistan ji pirr aliyan de li paşmaye. Mirov dikare bipirse; gelo çîma? Pirraniya mirovên Kurd dibêjin ku sebebê vê yekê kolonyalizm e. Bi dîtina min, heta dererekê mirov dikare vê bersivê qebûl bike. Lê bi giştî paşmabûna Welatê me, têne bi sebeba kolonyalizmê baş nikare bê famkirin. Kolonyalizm yet ji van sebaban e ku Welatê Kurd li paş hiştiye. Ev dîtin ji aliyeke de rast e. Lê ev ji bo dîtineke bi rêk û pêk ne bes e. Pirr sebeb jî hene ku heta niha bala Kurdan baş nekişandiye. Yek ji van sebaban, kultura Kurdan bi xwe ye.

Di kultura Kurdan de, bes du reng tenê hene. Yek ji van res e û yek jî sipî ye. Pirr caran cih e rengê sisîya re tune ye. Li gora vî mantiqî tiş ya baş in yan ji xerab in. Ji ber vê yekê ji, pirr caran li şûna munaqeşe, pevçûn çedîbin. Ev pevçûn di warê kultur, siyaset û danûstandina sosyal de, baş xwe dide xwiyakirin. Bi baweriya min ji niha pê de, divê Kurd dev ji pevçûn berdin û içar dest bi munaqeşê bikin. Munaqeşe wê me pêş de bibe û riya me zelal bike.

Gelê Kurd hewcedarê, munaqeşeyekî rasyonel e. Bi sedsalan li Welatê me munaqeşen kûr û ilmi cenebûne. Ji aliyeke de hêzen serdest û kolonyalist û ji aliyeke de jî tunebûna demokrasî, ketine pêsiya rexnegiriye û azadiye. Em hemû karin baş bibînî ku girêkîn civata kurd hîna vebûne. Ji bo Kurd karibin van girêkîn civakî û kulturî vekin, hewcedariya me bi kultura demokrasiye heye. Demokrasî ji hemû gelan bêhtir, ji Kurdan re pêwîst e.

Lê mixabin, pirr caran li şûna ku em girêkan vekin û problemen kulturî çareser bikin, em werîs ji binî de jêdikin! Li vir ez dixwazim mînakekî bidim. Wexta ku Iskenderê Zilqirneyn Enedolê fethkir, bîhist ku li bajarekî girêkî di werîsekî de heye ku kes nikare veke. Ji vê girêkî re digotin, girêka Gordiyon. Iskenderê mezîn ji çû û çendcaran xwe li girêka Gordiyon ceriband.

Lê, Iskender ji weke hemû ke-san nikaribû girêka Gordiyon ve-ke. Di dawiya meselê de Iskender hêrsbû (qehêrî) û ji nişkeva şûre xwe kişand û wêris jî binî de jêkir.

Mirov dikare bi hêsanî bêje ku, li Kurdistanê kesen ku werîsan jêdikin pirr in û ew ên ku girêka jî vedikin kêm in. Kesê ku werîsa ji binî de jêdikin, nikarin problemen kulturî û civakî çareser bikin. Ji bo çareserkirina problemen kulturî û civakî, Kurd hewcedarê rexnegirê durust in. Kesen ku li xwe ewle bin, pêwîst e ji rexna netirs in. Rexnê bas ji mirov re, hergav dibin alîkar.

Di warê kultur û edebiyata Kurdi de heta niha dîtinê rexnegiriye pêş neketine. Bi vê wesîlê mirov dikare bipirse; gelo li Kurdistan rexnegiri çîma pêş neketiye? Bi dîtina min rexnegirî, ji nêzîkayî ve bi dîtinê rasyonel re paralel dimeşe. Kesen ku ras-yonalizm li ba wan tune be, nikare xwe derbaske. Ji ber vê yekê ji, normen exlakî dikeve pêsiya rexnegiriye ilmî. Loma ji Kurdistan bûye behra subjektîvîzmî!

Di van salen dawî de, zimanê kurdi pirr bala min dikşîne. Baş diyare ku rexnegirî û ziman, ji nêzîk de tesîr li hev dikin. Di ferhenga zimanê kurdi de pirr gotinê ku dişîn gotina rexne (tenkit, eleştirî) hene, weke gazin, gili, lome û hwd. Li gora ferhengê, ev gotin bi giştî, nere-hetiya mirovan dikin. Kesê ku ji rewşa xwe ne memnun be, gazin, dike, loma dike, gili dike, lê qet rexna nagire. Li şûna rexna em gazinan dikin û bîstîkî dilê me ji rehet dibe. Lê bi vî awayî ji problemen me, roj bi roj mezin dibin û komî ser hev dibin. Di dawiya meselê de ji, Iskenderê Kurdan derdikeve û şûre xwe dikşîne, li şûna girêkî veke, we-rîs jêdike! Di rewsekî wiha de ji, gelek mirov dibêjin qey em pêşda çûne... Hinek ji me wisa dibêjin, lê girêkîn civata Kurdan ji hîn giredayî ne.

Serefhan Cizîri



İlyas Salman û Star 1

Di televizyona Tirkî, Star 1 de programek bi navê "Gotin gotinê tîne" heye. Hefta derbas bû hunermendê pêşverû İlyas Salman derkete vî programî.

Sipîkerê Star 1'ê Cem Özer e. Programa İlyas Salman kîfa hinek "guhdaran" revandîye û di vî programî de gotinê İlyas Salman ne-ecibandine, "Ji ber ku İlyas Salman zimanê xwe dirêje dewletê û hikûmetê kiriye." Herwiha cardî li gora van guhdaran hunermendê me İlyas Salman "ketiye pey

gehremâniyêñ erzan, heqaretê li hikûmetê dike, alîkariya seperatîf (bölük) û hêzên ku dixwazin Tirkîyeyê perçê bikin dike.


Di derbara vê meselê de İlyas Salman ci dibêje em nizanîn ji ber ku me îmkan nedît em raya hunermendê hêja bigirin û rasterast ji devê wî bighînîn xwendavanen xwe.



Reben Bilo li diji dewletê.

Li ser sopa EHMEDÊ XANÎ

*Jiyan û
berhemên wî*



● Navê Mem û Zinê di nav edebiyata dinê de bi Romeo û Jûliyet a Şekspir û Leyla û Mecnûna Fûzûlî re tê bi bîranîn. Rojhilatzanê mezin I.A.Orbelî, dema ku li ser edebiyata rojhilate radîweste; ji Îranê Fîrdewî, ji Gurcîstanê Rûstevelî û ji Kurdistanê Ehmedê Xanî helbestvanen hem mezin ên rojhilate nîşan dide

Felat Dilges

Helbestvan, pispor, nivîskar û filozofî nemir Ehmedê Xanî di berhema xwe ya bêhempa "Mem û Zinê" de, di beşê "Paşgotin û peyva bi qelemê re" de diroka hatina xwe ya dinê bi vî awayî dide:

Emma bi mirekkeba qebâih Rûres kirine gelek sefaîh Xettê te ye serniştî û sermeşq

Sih sale xetê xeta diket meşq Lewra ku dema ji xeybê fek bû

Tarih hezar û şest û yek bû ïsal gîhişte cil û çaran

Wi pêşerewê gunahkaran (1)

Herwiha em ji helbesta E.Xanî bixwe fêm dikin û hîn dibin ku zanyarê mezin di 1061 an de hatiye dinê. 1061 bi salnama Hîcrî ye; li gora salnama Miladî ev tarîx 1651 e. E.Xanî li gundê Çolemergê yê Xanî hatiye dinê. Her çiqas di hinek çavkaniyan de diroka hatina dinê ya E.Xanî 1591 tê beyankirin ji (2), ev tarîx çewt e. Hozanê nemir li Bazidê dike ser dilovaniya xwe, lê mixabîn diroka mirina wî ne kifş e. Pişti mirina wî, gora wî dibe zi-yaretgeha gelê Kurd û hê ji ji gelék deveren Kurdistanê mirov diçin ser gora wî. Di derheqê jiyanâ zanyarê mezin de ci heyf e ku tu berhemên nivîsandî di destê me de tune. Bi tenê em dikarin bêjin jiyanâ wî di xizmeta gelê Kurd û xebatê zanyarî de derbas bûye.

Herwekî ku em ji helbesta wî ji fêm dikin, dema ku E.Xanî dest bi nivîsandînê kiriye hê gelék ciwan e û di destpêka bîhara jiyanâ xwe de ye. Helbestvanê nemir di 14 saliya xwe de dest bi nivîsandînê dike. Gava ku nivîsandina berhema xwe ya

bêhempa "Mem û Zinê" diqedîne 44 saliye û li gora agahdariya ku ew dide 30 salê wî ye ku ew dinivîse. Heke em mercen Kurdistanê yên 300 sal berê biramin, em dikarin bêjin ku E.Xanî bi jîrikiya xwe "deha" ye. Lewra kêm kes di 14 saliya xwe de dest bi nivîsen edebî dikan.

Ji bili Mem û Zinê du pirtükîn E.Xanî yên din ji gihişte destê me. Yek ji vanan "Nûbara Biçûkan", ya din ji "Eqida İmanê" ye. E.Xanî ber-

hemâ xwe ya giranbuha "Nûbara Biçûkan" di 11'ê Adara sala 1094 Hîcrî (Miladî 1683) de nivîsiye (3) helbestvanê nemir wê gavê 32 salî ye. Nûbar, bi helbestî hatiye nivîsin û Ferhenga Erebi û Kurdi ye. Di destpêka her beşê Nûbarê de şîretek E.Xanî ya bi helbestî û bi wezin heye ku di dermafê xwendin, zanîn û têkiliyên civakî de ye. Ji xwe Nûbar li Kurdistanê baş tê naskirin; lewra pişti xwendin Quranê ew tê xwendin û jiberkin. Nûbar ferhenga Kurdi ya pêşin ji tê hesibin (4).

Gelo ji bili Mem û Zin, Nûbara Biçûkan û Eqida İmanê tu berhemên E.Xanî yên nivîsandî hebûn? Ev pirsekî girîng e û divê ku lêkolînvanen diroka edebiyata kurdi li ser rawestin. Lewra zanyarekî weki E.Xanî yê ku di çardehsaliya xwe de dest bi nivîsandînê kiriye, mirov pirr naxwaze ku baweriya xwe pê bîne da ku wî ji sê berheman zêdetir nedaye. E.Xanî di 44 saliya xwe de Mem û Zin temakir; berhemên xwe yên din ji beriya Mem û Zinê nivîsandibû. Gelo E.Xanî pişti ku nivîsina Mem û Zin qedand, dev ji xebatê xwe yên edebî û zanistî berda û li quncikê xwe rûniş?

Anku E.Xanî zû koç kir û çû ser

heqiya xwe? Ji ber ku em nizanîn E.Xanî kîngê rehmet kiriye, mixabin bersîvandina van pirsan bêtir dijwar dibe. Lî em bi hêsanî dikarin bêjin ku E.Xanî pişti nivîsina Mem û Zin jiyabe, întimalek mezin ewê xebatê xwe yên edebî û zanistî domandibe.

Li gora agahdariya ku Bazîl Nikîtin di pirtûka xwe ya bi navê "Kurd" (Kürtler) de dide, hin xebatê E.Xanî yên teorîk di dest de hene ku ev di mijara hunerî helbestê de ne (5). Celadet Alî Bedirxan ji ji hebûna pirtûkekî E.Xanî ya li ser Erdnîgariyê (coğrafya) qal dike (6). Béguman ev xebatê E.Xanî yên ku ji hebûna wan tê qalkirin, heya dernekevin roniya rojê em nikarin li ser wan tu şiroveyeki bikin.

Bi pirrani E.Xanî tişte ku dixwaze bêje, mesaja ku dixwaze bide di Mem û Zinê de bicikirîye. Heke wî Nûbara Biçûkan û Eqida İmanê nenivîsibûya ji, dîsa wî yê ev nav û dengê xwe bida bihîstîn. Ji xwe ew nav û dengê xwe bi Mem û Zin dide bihîstîn û bi vê berhema xwe ya bêhempa tê naskirin. Lewra ew bi Mem û Zin di diroka edebiyata Kurdi de şoreşekî dike. Ev şoreş ramân, edebî û siyasi ye. Béguman aliyekevî vê şoreşê yê ci-vakî ji heye; lê mixabin ev di dema E.Xanî de pêk nayê, bi derengî dikeve, bi salan pişti mirina wî jiyan dibîne.

Navê Mem û Zin di nav edebiyata dinê de bi Romeo û Jûliyet a Şekspir û Leyla û Mecnûna Fûzûlî re tê bi bîranîn (7). Rojhilatzanê mezin I.A.Orbelî, dema ku li ser edebiyata rojhilate radîweste; ji Îranê Fîrdewî, ji Gurcîstanê Rûstevelî û ji Kurdistanê Ehmedê Xanî helbestvanen herî mezin ên rojhilate nîşan dide (8). Li gora I.A.Orbelî, E.Xanî yek ji wan helbestvanen e ku pirr nêzî gelê xwe ye û bi gelê xwe ve girêdayî ye. Lêkolînvanen diroka edebiyata Kurdi Eleaddin Secadî, di pirtûka xwe ya bi navê "Mêjûy Edebî Kurdi" de, ji bo E.Xanî

AZADÎ

Abdurahman Durre



Bi wê qûşê tu naçî Mûşê

"D eyyusê ekbersin şeyhim, ben seni bilirim, ben seni bilirim." Yanî şêx min tu deyûsê mezin i, lê ez bi te zanim ez. Deyûs peyvekî bi erebî ye, ji mirovên bê ar û qewad re tê gotin..

Wisa rîwayet dîkin, dibêjîn ku di dema Osmaniyan de li İstenbolê şêxekî pirr namîdar hebûye, navbera wî û serayê ji pirr xweş bûye, ji ber vî awayî ji qedî û rûmeta wî ji pirr bûye, kes newêribûye di derheqê wî de tiştekî ne qenc û ne munasip bibêje. Mirîdeki wî hebûye ku dilî şêx di jina wî de bûye, belê mirîdê reben hem nikaribûye ku jina xwe ji şêx biparêze, hem ji newêribûye ku derdê xwe eşkere bîke. Belê her tim li hêviya keys û fersenda xwe bûye, ku sextekarî û durûtiya şêx bikaribe bêje û bide rûyê wî.

Rojekî şêx mirîdê xwe dicivîne, gazî paşê ji dike, dixwaze ku xwe bêhtir bike çavê paşê. Ji mirîdan re dibêje: "İro roja daxwazan û mirazan e, kî ci dixwaze dikare bêje, bi şertê ku paşê ji ferman bide û daxwazîyan pêk bîne. Paşê dibêje: "Bilabe, kî ci dixwaze bila bixwaze, ku şêx hezretlerî ji hîmet bike."

Şêx dest bi şalûzi û durûtiyan dike, ji nişkave diqîre û bi ser dev dikeve, qasek li erdê dimîne û radibe ser xwe, mirûzên xwe dike, dibêje: "Mirovek di nav civata me de heye, ku bi jina xwe re şîrê jineka cînarân vexwariye û bûne xwiş û birayê hev û haya wan ji hev tune. Ev pirr gunehekî mezin e, divê ku ji vir pê de ew ji hev biqetin." Paşa dibêje: "Şêx efendî ka bêje ew kî ne." Şêx xwe li xişmî datîne, dibêje: "Ez niha nizanim, lê ezê işev İstîxare bikim (di xew de ji xwedê bixwazim) bellî xwedê bi min bide zanîn." Mirîdê şêx tê digâhî û fêm dike ku wê şêx jina wî ji wî bide berdan û li xwe mar bike. Ji nav civatê radibe, destûr dixwaze û dibêje: "Dilê şêx di jina min de heye, dixwaze ku jina min ji min bistîne, vê derewê li hev tîne. Ji demeke dirêj de ye ku bi jina min re radibe û rûdinê, min heta iro ji tîrsa xwe newêribû bigota. Belê iro ku padîşah ji destûr daye "kî ci dixwaze bile bixwaze", ez ji padîşah dixwazim ku gazî jina min bike û ifâda wê bistîne. Şêx pirr hêrs dibe, dibêje: "Padîşahê min, divê tu cezayê vi deyûsê bênamûs bidî." Mirîd ji cih radibe, dibêje: "Padîşahê min, izna te hebe ezê di derheqê şêx xwe de tiştekî bêjim, pişti wî tu ci fermanî didî bide." Padîşah izin dide, mirîd berê xwe di de şêx û dibêje: "Hem şerîf yok hemde idrakin, deyyusî ekbersin şêxim velakin, ben seni bilirim, ben seni bilirim." Ü gazî jina xwe dike. Jina wî tê hizûra paşê dibêje: "Padîşahê min, mîrê min rast dibêje, eger tu bawer nakî, bila şêx xwe tazî bike, di cihê wî yê mehrem de ürek heye, di singê wî de ji cihê birînek." Şêx şaş dibe û di cihê xwe de mat dimîne. Padîşah dibêje: "Şêx teres de xeber de ka... Te xwest ku bi virr, sextekarî û hîlan hem bigîji meqseda xwe û hem ji kerametîn xwe nîşanê me bidî. Belê virrê te derketin, tu bûyi rezîl û riswayê alemê."

Ez vi çirokî tînim ser şêx û serokên politîkayen Tirkiyeyê. Xwestin ku xelata Ataturk a aştiyê (Atatürk Barış Ödüllü) bidin Nelson Mandela û xwe di çavê dînyayê de humanîst, demokrat û azadîxwaz nîşan bidin. Belê Mandela ev şêxen sextekar derxistin meydanê û bi dinê da zanîn ku keramet bi virr û derewan, bi sextekarî û durûtiye nabe. Belê hê ji hişê virrekan du buhust di ser serê wan re ye, dibêjîn Kurdan Mandela xapandiye. Ez ji we re rastiyê bêjim, tu kesî ji Mandela ne xapandiye, we xwest ku hûn wî bixapînîn, belê we nikaribû, lewre Mandela ji bo azadiyê bi salan di heps û zindanê faşîstan de maye, nîşana azadiya gelên bindest û mezlûman e, bi faşîstan mîna Kenan Evren re xelatên sextekariye qebûl nake û xwe nake pêkenînê alemê. Nizanim gelo we fam kir, gelî pêkenînê sextekar. "Bi vê qûşê hûn naçîn Mûşê".

"Sertaca nivîskar û helbestvanen Kûrtler", Weşanên Özgürlik Yolu, r:181
3- Ehmedê Xanî, Nûbara Biçûkan, weşanên Roja Nû, pêşgotin, r:5

4- E.Xanî Nûbara Biçûkan, r:5

5- Bazîl Nikîtin, Berhema Ku navê wê derbas bû, r:182

6- Qanadê Kurdo, Tarixa Edebiyata Kurdi, weşanên Roja Nû, r:120

7- E.Xanî, bhd. (berhema ku navê wê derbas bû), pêşgotin, r:8

8- Hêvi, Kovara Çandî ya gitî, weşanê Enstituya Kurd a Paris, hejmar:6, Rohat, 100 saliya bûyîna I.A.Orbelî, r:46

Dîsa di vê mijarê de binêre:

Gotinê leystikê zarokê Kurdan

Weke tevî wêjeyên Kurdî ê peyvînî, gotinê leystikan ji cihekî girîng digirin. Di lêkolînê xwe de çiqas min dinêri zarokê me di leystikê xwe de gotinê Tirkî digotin. Ez gelekî xemgîn û dilbikul dibûm. Ji ber ku ew gotinê me yên delal ji bîr bûne û hatine bişav (asimîle) kirin.

Hêviya min û daxwaza min ji xwendevanan ev e ku van gotinê ku ezê binivîsim bi zarokê xwe bidine jibekirin. Her wiha gotinê weke van bidine hev û bişeyînin rojnameya Welat, lewra ji bo zarokê me xebateke wiha zor pêwîst e.

Kerem bikin, pêñûs û defterê xwe amade bikin û ji bo zarokê xwe van çend gotinan binivîsin. Zor spas.

Yek û yek/ teyrikê belek/



Berhemên edebiyata kurdi asimile dibin. Divê em van berheman li hev kom bikin. Gotinê leystikan ji bi zarokê xwe bidine jibekirin.

zaza bilbil/ dermanê dil/ şenarincî
kir û şima/ li ber çema/
çemê Zazê av tê nema/ Ez Xanê/ çû meydanê/ se ber-

kuncî tu kuncî/ ser textikê danê/ ne gihanê/ kevçiya

werê ji kevçidanê/ Savêr
werê ji hebanê/ da xortê
malê bixwe noxşicanê/ dîwêr go xirrr/ pîrê go

pirrr/ sofî go rîhka min bi serde kurrr

Ev gotina ku ezê niha binivîsim, ji aliyê keçikan ve tê gotin û bi vê gotinê re wiha dileyîzin: Keçikênu ku ji bo leystikê li hev dicivin xwe dikine du komik. Li hemberê hev bi rîz dibin. Destê xwe dikine destê hev. Her komik serekvanekê digirin. Serekvan vê gotinê li hev û du werdigerînin:

Her Hopê/ qere topê/ pezkê Mîra li ku di çêrê/ Li zozana/ Çi dixwe?/ Gul û geyana/ Çi dirî? Safi herî/ Daweta kîjan qîzê?/ Ya hinde qîzê

Çirokê çîrvanokê/ rûnê rokê/ berda cokê/ cok miçiqû/ rûn beriqî/ golka xalê/ çû pişt malê/ ne gura xwar/ ne diza bir/go beee û biecî/ Berhevkar: Jîr Dilovan

Kêroşk û tajî

Di xwezal' !tebieta) azad de kêroşk û tajî da bûn dû hev. Kêroşk ji ber tajiyê direviya; tajî jî heta ku jê dihat wê diqewirand. Herdu jî di nav xwêdanê de mabûn. Bêhnçikiyayî û bêqewet ketibûn, lê dîsa jî dev ji hev bernedidan.

Tajî dikir nedikir nikarîbû bigîha kêroşkê. Çimên wî ji yên kêroşkê dirêjtir bûn, jê bêtir bazdida û jê xwirtir bû; lê dîsa jî nikarîbû kêroşk bigirta.

Hin bi hin navbera

kêroşkê û tajî vedibû. Tajî ji qeram ketibû. Ji betilbûnê nema karîbû gavkê bavêje. Ji xwe gumana xwe ji girtina wê jî qut kiribû.

Tajî di cih de sekînî. Deng li kêroşkê kir, go: -Kêroşka delal, ka bisekine. Ezê ji te tiştekî bipirsim.

Kêroşk sekînî û li pişt xwe nerî. Tajî ber bi wê dihat. Jê re go:

-Tajî tajî, li cihê xwe bisekine, nêzîkî min nebe. Tu dijminê min î. Ka bipirse bê tê çi bipirsî?

Tajî jî sekînî. Ji kêroşkê re go:

-Kêroşka xweşik, ka ji min re bêje. Gelo ez çîma nagîhêm te? Tu ji min biçûktirî, çimên te ji yên min kintir in. Ez ewqasî bi şida bazdim, ez bêhna xwe jî venadim: lê ez dikim nakim ez nagîhêm te. Min tiştek ji vî hawî fêm nekir.




Kêroşk kenîya, go:

-Ji xwe bêhişê wek te fêm nakin. De binere ez ji te re bêjim: Ez ji xwe re dibezi tu ji xelkê re

dibezi. Yanê ez ji bo azadiya xwe, ji bo xelaskirina canê xwe di bezim. Lî tu, tu ji bo xelkê dibezi. Ma ne wiyo ye? Ku tu min zeftbîkî ma tê min bixwî? Na,

wê xwediyê te min bixwe. Navê te li te ye: Tu tajî yî, tajiyê xelkê. Ji ber vê yekê jî tu, tucarî nikarî min bigirî. Vê yekê ji bîr neke: È ku ji bo azadiya xwe dibezi, ji yên ku ji bo xelkê di bezin, xwirttirin.

Berhevkar: H.Deniz



Rojekê quppê ji xwediyê xwe xeyîdî, çîçikên xwe dan dû xwe û çû çolê. Gava lê bû êvar xwe xist binê kemekê û çîçikên xwe xist bin perrê xwe. Deng ji xwe birandin.

Rovî çav bi perrê quppê ket, hat li wir sekînî kemê hejand go xiş xiş xiş xiş!

Quppê go tûq tûq tûq tûq...

Rovî go "Wî quppê tu li vir î!?" "Hey ku tu li vir î rabe em go vendekê bigirin."

Quppê go "baş e" û

govend girtin. Rovî go ezê dîlokekê bêjim. Quppê go "De bêje".

Rovî "Dîlim dîlim dîlano, ezê quppê bixwim tevî çîçano."

Quppê hêrs bû wê jî go "Roviyo destê min berde, wexta xwediyê min bê ji der de, tajî û tûlêñ wî di ber de, wê rovî li çolê wer de."

Rovî tirsiya go "Huşse! Dêlikê, ez ji wan xeberan ditirsim."

Berhevkar:
Rola Şilan

Welat, di demeke kin de wê dest bi çapkirina kitêbêñ zarokan bike. Niha em li ser kitêba Beşîr Botanî - Hebû Nebû dixebeitin.

Cezayê Beşikçi...

Destpêk rûpel 1

Ji 14 kitêbên wî 9 jê heta niha hatine komkirin û ji bo her kitêbekî bi mil-yonan ceza dixwazin. Li ser pîrsê cezayê peran vê dibêje Beşikçi: "Cezayîn fîkrê bi peran, skandal û şer-mek mezin e." "Dil û mîjîyî timamê azadiyan, azadiya fîkrî ye. Azadiya fîkrî tune be, azadiyê din bi kîrî ci-tîn. Tîrkiye û jiyanekî demokratik hê-pirr dûrî hev in. Kitêb û kovar çarnîkar û li hawîdror têne komkirin û ce-zakirin. Dewlet dixwaze çavên nivîs-kar û rewşenbiran bîşkîne û wan bê-deng bike. Demokrasî û şerê ji bo de-mokrasiyê kes nikare rawestîne. Dî-warên tîrsê ketine, em dê nesekin." Delîlên cezakirina vê carê ji mîna-yen hercar in: "Beşikçi dixwaze Tîrkiye perce bike." Li gora qanûna li dijê terorê madeya 8 an ev ceza ji Beşikçi û kitêbên wî re hatine.

Xwediyê weşanxaneyê "Yurt Kî-tap Yayımı" Ünsal Öztürk ku kitêbên Beşikçi çapkirine dibêje "EZ vê qe-

rare protesto dikim. Komkirina kitêb û kovaran qet qebûlnakim... Em dê kitêbên birêz Ismail Beşikçi biweşinîn. Ev wezifeyeke pîroz û rûmete."

DAXWIYANIYA MEBÛSEN KURD

16 mebûsen Kurd ên welatparêz, bî-yara (qerar) Dodgeha Ewlekarî ya Dewletê (DGM) ku ji bo pîrtükîn. Beşikçi 900 mîlyon ceza bîriyê protesto kirin. Ji bo vê yekê ji, civî-nek çekirin û di civînê de, belavokek pêşkêşî rojnamevanan kirin.

HEKİMOĞLU İSMAIL AVETİN ZİNDANÊ

Nivîskarê rojnameya Zeman Hekimoğlu Ismail salek ceza xwar.

Mehkema Enqera û mehkema Temyîzê li gora maddeya 159/1 û ceza ji Hekimoğlu re bîrrîn.

Hekimoğlu Ismail mirovîkî ni-vîskar e û ji rojnamevanan Rojnameya Zeman e. "Di meha Çile sala 1990, an de li dijê hêzîn eskeriyê meqaleyek nivîsibû. Navê meqâle "Naxwe wilo ha" bû."

dewletê, derketina rojnameyeke objektif û rast ji bo Kurd û Tîrkan derman e.

Xwediyê rojnamê Ekonom Yaşar Kaya, Berpîsiyarê giştî Rojnamevan Ragip Duran e. Rojname 12 rûpel in. Nivîskarê rojnamê ev in:

Musa Anter, Hüseyin Ergün, Haluk Gerger, Arslan Başer Kafaoğlu, Ahmet Kahraman, Tâner Kutlay, Ertugrul Kürkçü, Zafer Üsküld, Necmettin Yazıcı, Ragip Zarakolu.

Özgür Gündem...

Gîş haziriyê teknîkî, kadroyî û burokratikî ji bo derxistin û we-sandina rojnameya 'Özgür Gündem' demê temam bûne.

Rojnameya 'Özgür Gündem' rojnameyeke rojane ye û dê di 30'ê meha gulanê de derkeve sûka çapmenî û xwendevanan. Di demekê de ku rojnamegerî bûye şaxekî dewlet û hikûmetê, ferqa wan ji şirketên bazirganî û şexsî nemaye û bûne çepik-vanê xwînrejî û terorizma

rojnameyeke rojane ye û dê di 30'ê meha gulanê de derkeve sûka çapmenî û xwendevanan. Di demekê de ku rojnamegerî bûye şaxekî dewlet û hikûmetê, ferqa wan ji şirketên bazirganî û şexsî nemaye û bûne çepik-vanê xwînrejî û terorizma

ROJEVA WELÊT

Xetîp Dîcle dewletê îtham dike

Destpêk rûpel 1

Dewlet divê hilweşe û ji şerî de ji nuh ve li gora mîmarî û hostetiya demê bête avakirin.

Ferqa dewleta Tîrkiye termekî genî, laşekî cangiran û qesabekî bi xwîn nemaye. Termenî, cangiranî û qesabî giştî bi hev re di vê dewletê de ci-vyan e. Terka dar û koteke û metodên tîrsandin û perçîqandînê nake. Teror û xofê diafîrîne.

Kitêban ceza dike, hunermendan digre, nivîskaran davêje binê zîndana û giş mekîb û dibistanê biçûk û mezin kirine qışlîn eskerî.

Dewleta Tîrkiye xwîrte, li ser neheqî, çewsandin û talankirinê çêbûye.

Seha dewletê teng dibe, erd lê tê hev û di bin şikê û gûmanan de ye. Maye bi lingekî û bi alîkariya peran û zordariyeke bê sînor li Kurdistanê maye.

Ewil gund û piştre bajar ji bin kontrola dewletê derketin û berdewam derdikevin.

Ji bo dewletê du rî hene: Ya wê siyaseta dar û tîfîngê zor û zordariyê dom bike û yan ji dê di bin tesîra xebata li welat û zora ji derve de, li rî û çareyîn siyasi bigere. Heta niha çu nîşan û delîlen meyleke ji bo çareyekê siyasi û dialogê naxwîye.

Ji sala 1984 an û vir de dewletê û PKK berê xwe dane hev. Herdu allî di nav şerekî bê eman û xwînawî de ne. Roja ku xwîn nerije, dewlet û hêzîn dewletê negirin ser çend gundan yan ji bajarekî, tune. Her roj qeflek ji Kurden jin û mîr û ji her emri li ser riya zindanan in.

Zerara ku bi tenê ji meha Newroz û vir de li Kurdistanê bûye tîrîyonan derbas dike. Di 8 salêni dawî de hejmara kuştîn ji aliye dewletê û yê xelkê di vî şerî de bi qasî nîfîsa welateki biçûk tê. Hê ji dewlet dev ji zora xwe bernade û kîtiye pey şopa PKK û dibêje terorist e.

Dinya bi çavên dewletê li PKK nanêre, raya giştî li Ewrûpa û deveren din xwediyê dîtin û nerînîn xwe ne. Parlamenteñer Belçika ji hikûmeta Tîrkiye dixwazin ku bi niwîneren gelê Kurd re rûne û ji pîrsa Kurdish re çareyekê siyasi peyde bike. Kesén bi vî awayî difikirin hêdî hêdî zêde dibin.

Berî bi çend rojan, roja 25'ê meha Gulanê mebûsen Amedê Xetîp Dîcle, di radyoya Swêdê de axîvî û wî ji bêjî hema tiştîn ku parlamenteñer hikûmeta Belçika dibêjin gotin: "Dewlet bi xwe itîraf dike û dibêje 10.000 gerîllayen PKK hene. PKK vê reqemê derdixe 30.000 i. Qewetek ewqas mezin çawa kare terorist be?"

"Li Tîrkiye şer heye. Aliyîn şer dewlet û PKK ne. Me miraceeta yekîtiya Miletan kirine ji bo ku di şer de heqînîn insanî li ber çavan bigirin."

"Dewlet divê bi Kurdish re rûne. Ne şert e bi PKK re be ev rûniştin. Mebûsen Kurdish û serokbelediyen wan hene. Dewlet dikare bi wan re rûne û vî agîrî vemirîne. PKK di vê meselê de ne hişk e. Federasyonê ji amadeya minaçeşe bike. Bi baweriya min yê sücdar dewlet e. Mesûlê vê xwîna tê rijandin dewlet bi xwe ye. Lewra dewlet astî û lihevhatinê naxwaze."

Em ji di tîtina Xetîp Dîcle de ne û dibêjin berpîsiyarê xwîna heta niha hatîye rijandin û Kurd û Tîrkiye hatine kuştîn dewlet e, hikûmeta Demirel e.

Kurd hiqûqê şer dixwazin

Destpêk rûpel 1

Dinya û alemlâne li Kurdistanê iro şer heye. Şerî heye di nav PKK û dewletê de ye. Aliyîkî şer dewlet û yê din ji PKK û gelê Kurd e.

Şer di sala 8 an de ye û li ya 9 an nîzîk dibe. Her diçe xwîrtir, firehitir û xwînawîtir dibe. Timamê Kurdistanê û nîshbetek ji Tîrkiye ji vî şerî rasterast yan ji nerasterast ze-rarê dibine. Kurd û Tîrkiye kuştîn, birîndar û sejet dîkevin. Kurd û Tîrkiye malbaten paşê, General û zarwîn Holdîngan xaric kesê ku naxesire û şerî şivê neghiyê nema-ye.

Dewlet li kerê iblis siwar hatiye û ji êzingê xwe nayê xwarê. Ji meha Newroz û vir de şape li Kurdistanê rakiriye û her der kiye agir û barûf. Ketûber xelkê digre, dikuje û ne li emir û ne ji li cinsî insen di-

nere.

Yekîtiya Miletan û sazendeyen navnetewayeti gerek dest bavêjin vî şerî û qet nebe gerek dawê li Tîrkiye bi kin ku hiqûqê şer nas bike. Gelê Kurd û rewşenbirê demokrat û pêşverû yên Tîrkiye ji vê dixwazin. Di nameyeke rewşenbirê Kurd û Tîrkiye kuştîn re hate şandin ev dawê tê kirin. Di peralêla vê dîtinê de hin parlamenteñer Belçikî ji ji hikûmeta xwe dixwazin ku mesela Kurdish bibe yekîtiya Neteweyan û hiqûqê şer bî cih. Mebûsen Kurd ji piştgiriya vê pêşneyarê dikin û ew ji vê dîtinê dipesinîn.

Roja 25'ê Gulânê mebûsen Amedê Xetîp Dîcle derkete radyoya Swêdê. Xetîp Dîcle di beşa radoye ya bi tîrkiye qise kir: "PKK di terorist e. Ev îtham û fikra dewletê ye. Li Tîrkiye şer heye. Aliyîn şer dewlet û PKK ne. Me miraceeta Yekîtiya miletan kirine, ji bo ku di vî şerî de hiqûqê insanîn li ber ç-

van bê girtin."

"Dewlet bi xwe itîraf dike û dibêje: 10.000 hezar gerîllayen PKK û hene. PKK vê reqemê derdixe 30.000 i. Qewetek ewqasî mezin çawa kare terorist be."

"PKK nabêje illeh bila dewlet bi min re rûnê. Niwîner û temsîlkaren Kurdish hene: Mebûs in, serokîn belediyan in, namzet û endamîn meclisîn wilayetan in. Dewlet dikare bi wan re rûnê û vî agîrî vemirîne. PKK di vê meselê de ne hişk e, federasyonê ji amadeya minaçeşe bike. Bi baweriya min sücdar dewlet e. Mesûlê vê xwîna tê rijandin dewlet e, ne kesî din e. Lewra dewlet lihevhatin û navcîkirinê naxwaze."

Li hember axaftina Xetîp Dîcle niwînerê hikûmeta Demirel û İnnîti Turgut Tayan vê dibêje: "Ez bi nefret û xwîrtî axaftina Xetîp Dîcle protesto dikim." Turgut Tayan di meclisî de wekîlî grûba partiya Demirel e.

Di xwepêşandanê (miting) de, niwînerê ERNK û Hesen Akîf wi-ha got: "Em dixwazin pîrsa Kurdish bi rîyeke siyasi û demokratî bê çareserkirin. Lî dewletâ Tîrkiye nîzîkê vê riyê nabe. Divê ku we-latîn Ewrûpî ji bo çareserkirina vê prisî Tîrkiye bîşidînin.

Di meşê de 5 hezar alayen ERNK û hatîlgirtin. Di meşê de ev siloganen han gellek caran hatîn avetin: "PKK gel e, gel PKK ye. Bişî tîkoşîna rîzgariya neteweyâ me." Yekîtiya gelê Kurd di bin ala ERNK û de çêbûye. Gelê Kurd bi biryar li doza xwe û li pêşengiya xwe xwedî derdikeve.

Kurd meşîyan

ERNK û Partiya Kesk a Belçikayê, li Brukselê bi navê 'Azadî ji gelê Kurd re' meşekî pêkanîn. Ev meş, di 20'ê Gulânê de çêbû. Ji bîlî Kurdêlê welatparêz ên li Ewrûpâye, gellek mirovîn navdar û komeleyen demokrat ji besdarî vê meşê bûn. Ji Belçikayê Partiya Demokrat a Xiristiyan, Partiya Sosyal Demokrat, FGTB-Sendîqa, ji Almanyâye Partiya Sosyal Demokrat-Bremen, Partiya Kesk, ji Fransayê CGT-sendîqa, ji Yûnânistanê PASOK, ji Qibrise

EDEK, ji Avusturyayê Partiya Sosyal Demokrat, Partiya Kesk, ji İtalyâye Partiya Cep a Demokrat, Partiya Kesk, Partiya Sosyal Demokrat, ji İspanya, Bask û hwd. Gellek partî û organîzasyon niwîneren xwe şandin meşê.

Di dawîya meşê de, niwîneren Partiya Sosyalist Jef Sleecx, senatorê Partiya Kesk Ulu Burx, senatorê Partiya Sosyal Demokrat Hugo Van Rompau, mebûsen PA-SOK û delegeyê AT û Alvanos, sekreterî siyasi yê déra Katolik a Londrayê Mikail Freeney axaftîn kirin.

Dewlet tovê neyartiyê

Destpêk rûpel 1

Lewra ji tîrsa livbaziyan kontra xwestin xwe bi vî awayî biparêzin, serzabitê leşkeran digot, çuma hûn tev li malekê dicivin, hûn propaganda PKK û dikin ne wisa? Lî bi rastî li her gundî, ji tîrsa kontra gundî tev li hev kom dibin ji bo ku xwe ji kontra biparêzin, lewra ji bo ku birayê min Ismail tenê li gund zeft kirin, kontra ew revand û qetikirin.

Leşkerê Tîrkiye dest bi diziyê kirine, bi heyânî radyoya pismamî min Muslim Yîgit dizîne, qey ev ne şerm e, qey ev ne hetîketi ye ji dewletê re, serbaz ji leşkerê xwe re digot: "çentê Elî bişkînîn, belkî sûretîn wî û APO em zeft bikin, ji bo ku di destê me de bibe delîl..."

Politika dewletê li hember gel
Kurd bi ci awayî tê meşandin?

-Ev zîlm û kotekiya dewletê roj bi roj tûjtir dice. Dewlet ji mafê mirovahî û demokrasiyê behs dike, lî ez dixwazim ku tev mirovîn demokrat mebûs û qurûmîn ku hene werine Kurdistanê li rewşa gel û kotekiya dewletê mêze bikin, mirovîn Kurd dibin zîlm û kotekiyê de ne, hêzîn tarî mirovîn ku di herêmî de têne hezkirin, dikujin.

Tîrkiye nehişt alîkarî here ji Kurdish re

Destpêk rûpel 1

Ev çend roj in gumruka Tîrkiye li Xabûrê dest daniye ser 40 kamyonên hikûmeta Alman. Kamyonên hikûmeta Almania li ser riya başûrê Kurdistanê bûn û dê alîkarî bibirana ji Kurdish re.

Li gora meqamên dewleta Tîrkiye di nav barê kamyonan de malzemeyen eskerî hene. Hêç hikûmeta Almane bi şikleki bi xwe bawer tiştî hikûmeta Tîrkiye dibêje red dike û dibêje barê kamyonan me ji alîkarîya insanî pêve ne tiştîk e.

Mekteb bûne qîşle

Destpêk rûpel 1

bajarê Aydinê, (ev bajar li Tîrkiye ye) xwendevanê lîse, sinifî duymenî e, Kurd e. Dê û bavên wî siyasi ne û wa diyar e hez ji welatê xwe dikin û dixwazin bi Tîrkiye navçê re tekiliyê baş çekin û bibin rîgir li pêşîya dijmi-nayetiya Kurdan û nîjaderestiyê.

Berî bi çend rojan, rîyâne mekîb û Midûrî lîsa Atatürk ku K.G. xwendevanê wê ye K.G. di din mehkema idara mektebê û wî ji wir sirgûn dikin. Dîlîn Midûr û mehkemeya mektebê ev e "K.G. li mektebê û li derveyî mektebê si-

yasetê dike, propaganda siyasi dike. Li nav bajêr belavok belav nekîrine û min di ifâda xwe de ev ji polîs re ji got. Mesela çûna sevî rast e, ne ez bi tenê em gelek kes, ez û hevalîn xwe em çûna seva HEPê. Belê ez Kurd im û baweriya min ew é ku giş şagirt û xwendevan bira ne, milliyetê wan ci dibe bila bibe. Tiştî idare di derheqê min de dike ne heq e. Ez li hemberê neheqiyê me". súcekî min hebe ez ji Amedê me û ez Kurd im.

mafîn mirovan ên parlamento Finlanîya ne. Ji bo ku em rastiyê di cih de bibînîn û bibin ji gelê xwe re diyar bikin, em hatîn vir.

Dewlet li herêmî terorcke mezin bi kartîne. Em dixwazin ku her neteweyek qedera xwe bixwe tayîn bike. Mafîn Kurdan ji heye ku qedera xwe bixwe tayîn bikin.

Heyet li Amedê ji civîneke çapmenî çekir. Niwenêre heyet

Lêkolînvanê çand û dîroka Kurd Cemşîd Bender:

'Ne ji têkoşîna neteweyî bûya emê lal bimana'

Kekê Cemşîd Bender, ji kerema xwe re jiyana xwe bi kurtayî hûn dikarin bînin ziman?

-Belê keko, ez di sala 1927 an de li bajarê Konyayê hatim dinê, dayika min bi malbata xwe ve ji navçeya Wanê Başkale, bavê min jî ji navçeya Bingolê, Kixi, gundê Şaruk, bi rîwîtî berê xwe dane bajarê Edenê di dema (umumî herbê) de. Ez mihacir ji dayika xwe bûme, em ji warê bav û kalênen xwe hatin koç kîrin, belê bi mihacir bûna me jî feydeyek li me bû, em ketin dibistanê, îmkanen xwendinê ji me re hatin afirandin, bi alîkariya bavê xwe di sala 1958 an de li Fransayê ez bûme Doktorê Hiqûqê, li Norevê îxtîsasa qoperatîfê min kir, di sala 1960 an de ez vegeriyame Tirkîyê, piştî 27'ê Gulanê bi sê rojan bi emrê wezîrê karê hundir (İçisleri bakanı) ez hatime girtin, bêyî celba tewqîskirinê ez avêtime pişt deriyê hesinî. Di 27'ê Çiriya pêşîn sala 1960 an de efû derket, bi vê yekê ez hatim berdan, heyanî sala 1974 an li Konyayê min Ebûkatî kir, piştî ez çûme Norevê di sala 1983 an de, cardin ez vegeriyam Tirkîyê, lêkolînên min li ser dîroka Kurd çand û şarezatiya Kurd çêbûne, iro ez jiyana xwe bi vî awayî li bajarê Izmirê dom dikim.

Li ser Kurdan û gelê din heyanî roja iro çend pirtûkên we hatine weşandin?

-Bi rastî di çaxê dibistana lîseyê de, li Konyayê di sala 1945 an de min kovarek weşand, di rojnameya herêmê de min meqâle ramyarî (ramyarî) dinivîsand. Di sala 1950 an de berhemên min di "varlık, Türk dili İstanbul" û kovara Çax de hatin çapkîrin. Li welatê Ewrûpî jî hinek çîrokên min hatin weşandin, li Norevê Danîmerka, Yûgoslavya di kovarên wêje de hatin weşandin. Di sala 1968 an de li Yûgoslavya li ser dîroka çîrokên Tirkî li Üsküpê di hejmara deng de (ses) bi taybetî hate çapkîrin di hêla çîrokan de du pirtûkên min hene, bi navê xwe ev in "Gülen inek û Karides durağı" du pirtûkên min ên din jî li hêviya çapemeyî ne ku ez weşanxanek rind bibînim ezê çap bikim, lêkolîna min a nuh pirtûka "Konya sazi ve türküleri" bû,

CEMŞİD BENDER: "Bi pirrayî min giraniya xwe daye ser lêkolîna çanda Kurd û dîroka Kurd, li welatê Ewrûpî jî xebata min tev bi vî rengî bû."

navê "Kürt tarihi uygarlığı, Kürt uygarlığında alevilik" du pirtûkên min hatin çapkîrin, dîsa di eynî salê de bi navê "Kürt mutfağı ve kültürü" pirtûkek min hat weşatin, ez bi vê gelekî şanaz bûm.

Bi pirrayî hûn giraniya xwe didin ser kîjan lêkolînan?

-Bi pirrayî min giraniya xwe daye ser lêkolîna çanda Kurd û dîroka Kurd, li welatê Ewrûpî jî xebata min tev bi vî rengî bû.

Heyanî iro li ser çand, ziman, wêje û dîroka Kurd fonksiyona kîjan, nivîskarê Kurd hatiye afirandin?

zahfîn wan ne li dinê ne; ez hurmetkarê wan im û bîranîna wan dikim, weke Eliyê Herîri, Şêx Ehmed, Melayê Cizîri, Feqiyê Teyran, Melayê Batê (Mela Ahmet), Ehmedê Xanî, Ismailê Beyazîdi, Şeref Xan, Beyazidî Murhan, Hakarîli Şahparto, Mahvî Haccî Kadir ko, İ.Abdullah beg, Misbah al-divan, Şêx Razay (Riza) Tahir beg, Fattah Şahib Kiran, Mustafa beg.

Zilm û kotekiye ku Dewleta Tirk li ser gelê Kurd dike hûn çawa dibînin, ev koneyanî heyanî kengê wê dom bike kelemê pêsiya vê zilmê ci ye?

dikin li ber çava ye. Lewra nijadperestî û şovenîzma dewletê rind kifş bûye, lewma ez dibêm ez dilxwes im, rûyê xwe yê şovenîst û siyaseta xwe ya dualî li ber çavê cîhanê, birêzkr. Ez dixwazim bi birafî ev gelê ku em bi hev re dijin zilm û kotekiye ku li ser gelê Kurd dibe pê zanibin, şiyarbin û bêdeng nemînîn.

Tewra di navbera her du gelan de tovê neyartî yê davên, kûr dikin, belavokên bi dizî belav dikin. Li Izmirê dezgehê 10 hezar kesan bi mekinen presê diperçiqînîn, bi sed hezaran malbat neçar û perîşan dihêlin, di inşeatan

● "Gellek ronakbîrê Tirk heke ne li hemberî pirsgirêkê Kurd bin jî bêdeng û bê eleqedar in, lewra ji sed salan de di bin tesîra ideolojiya resmî de mane, digotin em tev birayê hev in, lê dîsa jî qirkirin, zîl û koteke cardin berstûka gelê Kurd ber nedaye. hêviya me ewe ku gelê Tirk û Kurd, dest bidin hev bi birafî, li hember fen û fûtûn dewletê bibin yek û cokê aştiyê vekin"

-Rûyê dewletê iro bi her awahî derketiye holê, tiştekî veşarî ne maye, li ser çand û zimanê Kurd qedexeyen ku dikin li ber çava ye. Lewra nijadperestî û şovenîzma dewletê rind kifş bûye, lewma ez dibêm ez dilxwes im, rûyê xwe yê şovenîst û siyaseta xwe ya dualî li ber çavê cîhanê, birêzkr. Ez dixwazim bi birafî ev gelê ku em bi hev re dijin zilm û kotekiye ku li ser gelê Kurd dibe pê zanibin, şiyarbin û bêdeng nemînîn.

de karkerê Kurd ji bo nexebitin dixine işkencê, li taxa Kadife kale, Esendere û Çamlîk Kurdên ku li wê dijin her şev digrine ser malen wan, dewlet li ser Kurdên metroplô heşkere zorbaziyê dike hêviya me ew e ku gelê Tirk û Kurd, dest bidin hev bi birafî, li hember fen û fûtûn dewletê bibin yek û cokê aştiyê vekin, qedera van herdû gelan yek e, ji sed salan de bi hev re dijin, heyanî iro tu neyartî di navbera wan de çenebûye ez bawer im ku wê herdu gel dest bidin hev bi birafî û wekhevî li cem hev bijîn û tixumê neyartiyê ji holê rakin. Bi lêdanxanan, bi zîl û koteke, bi girtîgeha, bi mîjîyê cûnta, dewleta Tirk negihaye serê xetê û nagîhê jî. Girîng e ku her mirov vê rind bizane, dewlet di hêlekê de çavê xwe, ji lêkolîna çand û dîroka Kurd re digire, di hêla din de jî, lewha Enstituya Kurd ji ber dike, rakirina vê lewhê di hemû radyo û televizyonen Ewrûpa de bû behs, ez sual dikim, ka hikûmetê ji vê çîqas fêde stand? Bi rakirina riknê 141-142 hêj tûjtir û girantir rikin danîne, li ser lêkolînên dîroka Kurd gelek astengan derdixînin. Belê wê roj were emê van astangan jî derbas bikin, girîng e ku em ji bûr nekin em di riyeke zehf zirav û dûr û dirêj de ne, bi bêhnfirehî, bi bawerî û evînî girîng e ku em riya xwe bistînîn.

Kekê Cemşîd ronakbîrê Tirkîyê ji bo pirsgirêkê Kurdan heyanî iro bêdeng mane, çavê xwe girtine iro jî ev ramana wan dom dike, di binê vê de gelo tesîra Kemaîzîmê heye, an mirov kare tişten din birêz bike?

-Gellek ronakbîrê Tirk heke ne li hemberî pirsgirêkê Kurd bin jî bêdeng û bê eleqedar in, lewra ji sed salan de di bin tesîra ideolojiya resmî de mane di wexta İslamiyetê de bi çend sozê xweşik digotin em tev birayê hev in, lê dîsa jî qirkirin, zîl û koteke cardin berstûka gelê Kurd ber nedaye.

Heyveyîn: S.Arjen

- Li ser navê IMC Basın-Yayın Ltd. Şti. (adına) Xwedî (Sahibi) Zübeyir Aydar • Mudurê Dezhgahê (Müessese Müdürü) Zübeyir Çakır
- Berpîrsiyare Giştî (Genel Yayın Yönetmeni) Abdullah Keskin • Berpîrsiyare Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü) Mazhar Günbat
- Navîşan (Adres): Nuruosmaniye Cad. Atay Apt. No:5 Kat:1 D. 4 • Cağaloğlu / İstanbul • Tel: 511 57 60-511 66 02
- Fax: 511 51 57 • Berpîrsiyare a Ewrûpa • Postfach: 1531, 5300 Bonn 1, Germany • Tel: (49) 228-630990 • Fax: (49) 228-630715
- Çapkirin (Baskı): Metinler Matbaacılık • Belavkirin (Dağıtım): Birleşik Basın Dağıtım AŞ

